

2018 Îlon • Jimar 2

POP KURD

e-Kovara Populer Kulturê



Populerbûna Muzîka Kurdî • Besime Şen



Loading... • Rozerîn Tadiç



Popirs • Alan Ciwan



GANÎ MÎRZO ;
MUZÎK 'ILMEK E.
LAZIM E MIROV
BIXWÎNE, SERÊ
XWE PÊ BIÊŞÎNE

Merhaba xwîner û bendewarên POPKURD'ê!

Em bi kelecana û bextewar in. Lewre em bi hejmareke nû ya dijîtal tîn hafa we.

Em dizanin parî bi derengî ket lê va ye hejmara duyem hat ber destên we. Heta ji me hat, me xwest em naverokê xweştir û rengîntir bikin. Bi hêviya ku kêfa we jî jê re were, kerem 'kin.

EDÎTORIYA POPKURDÊ

POPKURD
2018 Îlon • Jimar 2

Berpirs û Edîtor

Mistefa Dogan
Omer Bextiyar
Ridwan Xelîl

Rûpelsazi

Ridwan Xelîl

Em berpirsê
hemû nivîsên we ne!



NAVEROK

Rihletguzîn:
Ber Bi Kenya û Tanzanyayê Ve...
POPKURD04

Karîkatur
Xweza Şen10

Bienala Mêrdînê
û Hunermendên "Herêmî"
Mistefa Dogan11

Pasaj:
Hesenê Metê13

Reportaj:
Ganî Mîrzo
POPKURD14

Kenê Min Nayê!
Özge Süer17

Awayên Populerbûna Muzîka Kurdî
û Çend Tespît
Besîme Şen18

Loading...
Rozerîn Tadik21

Popirs
Alan Ciwan23

Dengbêj Zahiro:
Dengbêjîya Berê Nemaye!
Salihê Kevirbirî25

Îllustrasyon
Xweza Şen28

Astrolojîya Kurdan
Zewijîyayîş Yan Nêzewijîyayîş
Şadê Agon29

Popwêne
Tehsîn Baravî31

Bingehên Rojnemageriyê
Û Rojnamegeriya Kurdan
Murat Bayram.....32

Reklam
Inanolo.blogspot.com35

Me Ji 10 Kesan Pirsî
POPKURD36

Çend Agahî Li Ser Sînemaya Kurdan
Salih Suleymanî.....39

Danasîn:
Kovara Psychology Kurdî
POPKURD42

Ez Diçim Mosko
Gulsuma Demir43

POPNUÇE
POPKURD43



RIHLETGUZÎN

Mihemed Bîlen

Soberiyek ber bi reşikên Kenya û Tanzanyayê ve...

Kengî behsa Efrîqayê bê kirin, wekî her çavê ji derve li wira dinihêre, ji tunebûn û sefaletê bêserûber pê ve tiştek nedianî bîra min. Ew der wekî bazarakê koleyan, welatekî ku bi destê ko-lonyalîstan hatiye ve tazîkirin û gencîneyên wan hatine talankirin di bîra min de mabû. Û helbet wekî parzemîna lîstîkvanên futbolê û binemaleke gewre ya dans û muzîka cîhanî jî.

Berî ku em pilansaziya çûyina xwe ya Kenya û Tanzanyayê bikin, me pilaneke din hebû. Hesabê me ew bû ku em biçin Mozambîk û Madagaskarê. Him ji ber astengên fermî yên Madagaskarê, him jî ji ber hin kitekitên zahmet ên rêwîtiyê em mecbûr man ku berê xwe bidin Kenya û Tanzanyayê. Ji ber ku der-barê Madagaskarê de min gelek lêkolîn kiribûn, vegera jî devê rê, hêviyên min serobino kiribûn. Digel vê yekê, baş bû ku pilana me guherîbû û em çûbûn Kenya û Tanzanyayê, serpêhatîyeke bêpayan bû ji bo min. Bêguman Madagaskar ji ber bi hezaran cûre ajal û nebatên endemîk di nav daristanên xwe de

di-hewîne û faunaya herî berfireh a ser rûyê erdê ye, di rojeva her benî ademê serguzezt de bi çavê dinyê dîtina Madagaskarê heye. Beriya 75 salan şair û edîbekî Kurd ê navdar jî demeke kurt li wira jiyaye. Yek ji entelektuelê nîfşên Hawar û Xoybûnê Osman Sebrî, gava li Mûsulê tê girtin Frensî ew di 1936an de sirgûnî Madagaskarê dikin û ew bi qasî du salan li wir dijî. Wexta Osman Sebrî diçe Madagaskarê li wir pêrgî sê gundên Kurdan jî tê, piştî di derbarê wan gundiyan de hindêk lêkolînan dike, dibîne ku ew jî wekî wî ji Kurdistanê mişext bûne û tevahiya gundiyan zimanê xwe ji bîr kirine. Yanî ev yek tenê bi serê xwe mijareke balkêş bû ku Kurdekî ber bi xwe ve bikşîne, ma ne?

Kesên bixwazin welatên Efrîqî bibînin, divê berêpêşin biçin ji Navenda Tenduristîya Geştiyaran a dewletê û ji bo parastina ji nexweşiyên wekî Tîfo, Dysentery û Yellow Feverê; hin dermanan bigrin û hin derziyan li xwe bixin. Ev tablet û enjeksiyonên li vê derê dê bêne dayin ne dermanên wisa sivik in, heta hindêk ji wan wekî ku mirov Magic Mushroom xwaribe dikarin mirov noqî halusînasyonan jî bikin û sergêjiyeke bi qasî du sê rojan çêbikin.

Heger mirov cara pêşîn çûbe welatekî dût û xerîb, xwarin bi serê xwe problemek e. Divê bo vê yekê jî hûn bi tevdir bin, ji ber ku xwarinên başûrê Efrîqayê bi biharat û giran in; berî ku em bi rê kevin me çen-teyên xwe bi konserveyan dagirtibûn. Ji tirşika fasûliyan heta findeq û fisteqan, ji zeytûn û penêr, heta gwîz, bastîq û baqismatan.

Hingê balafir wekî îro ji Stenbol rasterast tune bûn bo Nairobi an Darusselamê. Balafir mecbûr bû biçûya Sharjah an jî Dubai, ji wê derê jî dê berî bidaya Nairobiyê. Di transferên wiha de îxtimal mezintir e ku barê mirov wenda bibe. Her çi qewimî, di wê transfera Sharjahê de qewimî. Ew çenteyên me yên heta devî me bi kûmanyayê dagirtibûn, wexta em daketibûn balafirgeha Nairobiyê wenda bûbûn. Ne yek jî, dudo! Tevî çenteyê yek ji hevalê min î seferê. Her çiqas berpîrsên kompaniya Air Arabia li balafirgeha Nairobiyê bêserî li çenteyan geriyabûn jî encamek ji wan negirtibûn. Me jî di ber xwe re gotibû heger em vegeriyan Stenbolê xwedê ji me û ji Air Arabia re mezin e.

Berî em birêkevin, li navenda Nairobiyê me li otêlake cih veqetandibû. Em li wir bi cih bûn. Ji balafirgehê heta em gihîştin otêlê, yanî di wê rêwîtiya kurt de, kaos û feqîriya bajêr wek topeke ji êgir bi ser me de hatibû. Şênîyên bajêr di nav bazareke dipdirêj û belawela de, bi xezeb û lezûbezeke ecêb bi xwe daketibûn. Wiha tevdişgeriyên ku, wek hawê wê kêliyê hicûmî bazarê nekin wê tiştêk ji wan re nemîne û dê wê salê birçî derbas bikin. Ev tunebûn û feqîriya li vê derê behsê dikim, ne wekî sûretekî klasîk ê li Somalîyê bû; tunebûneke wekî din bû ya me didît: Tunebûneke gelek elimandî. Çer ku li ser sifreyên malên qerebalix êrîş li xwarinê tê kirin û ev yek dibe elimandineke mayinde ji bo hin zarokên wê malê, êrîşkirin jî elimandineke kronîk bû li vêderê.

Roja duyem, piştî ku me çend qor li nav bajêr xistin û ji bazarê hin cil û bincil ji xwe re kirin û bi torbeyên Bauhausê li kuçeyên Nairobiyê me xwe li ba kir, paşê ji bo pilansazî û veketinê me xwe avêt otêlê. Bernameya me ew bû ku me yê seyareyek û şiferek peyda bikira, dût re em ê biçûna Moshiya ku çiyayê Kilimanjaroyê bi ser ve ye ku jê re dibêjin banê Efrîqayê... Kilimanjaro çiyayekî ezamet e. Ji çiyayê me yê Agirî jî berztir e û bejna wî digihêje 5.895 me-





treyan. Piştî çend rojên li Kilimanjaroyê, me dê berî bidaya Arushaya qedîm ya ku li ser riya Serengetiyê ye. Ji Serengetiya dirinde jî em ê biçûna Da-russelama paytextê kevin ê Tanzanyayê. Ji Darûsselam bo Stone Townê, ji Stone Townê jî me yê xwe bigihanda Zanzîbarê: Girava bêdengî û aramiyê ya di nav Zeryaya Hindî de. Vegerê jî, ne ji heman rêyê, lê em ê ji ser xweşiktirîn bajarê Kenyayê, ew bajarê ku zerya wî dike çar parçe, yanî ji Mombasayê vejeriyana Nairobiyê. Wekî hûn dizanin serê Stenboliyan bi bajarê wan mezin dibe ku dibêjin ji nav bajarê me derya derbas dibe. Ger wisa be divê Mombasayî bi bajarê xwe sedî sed bifirin, ji ber ku yê wan, ji çar aliyan zerya ji nav bajêr derbas dibe... Şifêrê ku me ew bi tesadufî peyda kiribû Jeffrey, yekî têra xwe zîrek û bi kêf bû. Piştî ku bi salan wî li ber destê xelkê şifêrtî kiribû, ev demek bû pikaba şexsê xwe stendibû û teksîdên pikabê jî hindik mabûn. Wexta pilana rêwîtiyê me danî, Jeffrey jî li ba me bû û di wan rojên rêwîtiyê de em biçûna ku ew ê ji bi me re bûya... Berî em bidin ser rêya xwe ya dirêj, wî em li bajarê xwe Nairobiyê têr gerandin û kengî di nav axaftinekê de me gotibû em Kurd in, wî jixweber ji me re gotibû wexta 'Okalan' hat şandin ez li ber wî ketim. Naskirina wî ya Kurdan û Ocalan pir bala me kişandibû,

li gor ku wî behs dikir wexta Ocalan dişînin Tirkî, li ser wî gelek nîqaş çêdibin li Kenyayê.

Li her kolanên Nairobiyê heman stran olan dide, wexta em lê dipirsin Jeffrey dibêje starê herî navdar ê Efrîqayê ye, navê stranbêj Flavour e û navê stranê jî 'Sawa Sawa Lê' ye. Kêfa me gelek jê re tê. Di rêwîtiyê de em her guhdariya wê stranê û Maria Salome ya Saida Karolî dikin ku navê Saida Karolî ji ser sînorê Kenya û Tanzanyayê jî furiyaye û helbet strana Spack-Tundaman ya Nipe Reputi.

Derengê şevê em bi rê ketibûn û şeveq bû em gihîştibûn Moshiya ku çiyayê Kilimanjaroyê bi ser ve ye. Me di otêla Nakara de cih veqetandibû ku li quntara Kilimanjaroyê bû. Daristaneke wisa zexm, keskeke wisa tarî min nedîtibû heta wê rojê. Digel ku em pir westiyayibûn jî wan çend saetên ewil wekî ku oksîjen kezeba me bide ber jilêtan nehiştibû em bitevizin. Jixwe em jî nehatibûn ku rakevin... Divê mottoyeke her serguzeşteki/ê hebe be, û dikare ev be; 'Ma em nehatine rakevin lo!'. Piştî nivro gava hewa piçekî hênik bû hêdî hêdî em hilkişiyana Kilimanjaroyê. Her çiqa ez bêjim em hilkişiyana jî hûn bawer nekin. Ji ber ku em çiqa hilkişiyana jî dawî lê nedihat.

Yek ji çîroka Hemingwayî ya navdar The Snows of Kilimanjaro li naveyna quntarên Kilimanjaro û beriya Serengetiyê diqewime. Nivîskarê ku di dema safariyekê de bi enfeksiyoneke giran dikeve û li ber sekretê ye, rabirdûya wî tê ber çave wî ku bi sedan xwezî û poşmaniyan tijî ye. Li çolekê li benda mirinê ye û di dawiya heyata xwe de ew kesa dixwaze li ber serê wî be, ne ew eyal an jî hevser e. Şaşî û xe-letiyên xwe yên rabirdûyê yek bi yek tîne bîra xwe lê çî heyf ku nikare wan şaşîyan telafî bike. Di seranserê çîrokê de mirov pêrgî van veger û flashbackan tîne ku her bîranîn bi xwezî û poşmaniyeke bêqedar dagirtî ye. Beriya mirov bide ser rêya Tanzanyayê, dê baş be mirov çîroka Hemingwayî bixwîne ku di nasyariya Kilimanjaroyê de gelek muhîm e.

Nakara, tevî ku otêleke mezin bû, ji me pê ve tu mêvanên wê tunebûn, digel ku 15-20 xebatkarên jî di otêlê de kar dikir. Xwedan û berpirsa hotelê jineke henûn bû û hemû xebatkarên otêlê ji wê re digotin Mama. Mêvanperwerî û mazûbaniyeke ewqas maqûl derî adetê bû, mirov li ber xizmet û kubariya wan nizanibû çî bikira. Xwarinên pir bi lezet ji me re çêdikirin: Ji şorbeya xiyaran heta ya kundiran û ji şorbeya mûzan bigirin heta gelek şorbeyên cihêreng. Taştê bêyî mango, omlêt û goştê berazan ê biraştî nedibû... Li Kilimanjaroyê markayên bîrayên herî biekl Safarî, Serengetî û Kilimanjaro bû; ev hersê bîra pir dihatin hezkirin û ji avê zêdetir dihatin vexwarin. Herî zêde jî bîraya bi nave Kilimanjaroyê ku xelkên wê derê jê re bi kurtasî digotin Kîlî. Bêyî hûn bixwazin, garson bîrayeke nuh ji we re dianî...

Berî roja ku em ê ji wir veqetin, me jî xwest em surprîzek ji bo wan bikin û şîva dawî em ji wan re çêkin. Ji gundê herî nêzîk me danûstendina xwe kir û me ji Mama xwest hemû xebatkar bibin mêvanê me yê şîvê. Ji ber ku ji me pê ve tu mişteriyên wan nebû, Mama pêşniyara me bi kêfxweşî qebûl kir û got; ji bo zarokên me jî wê bibe şahiyekê xweş. Berxikê ku me ji gundiyekî bi bazareke kurt bi 50 dolarî kiribû me li ser êgir biraşt û birinc û zelateyek li ber danî. Her tişt adet û ûsulê hat hazirkirin. Êvarî hêdî hêdî mêvanên me bi cilûbergên xwe yên sivil ên spehî ber bi maseyê ve kişîyan. Kêfa wan pir ji şewaza biraştinê ya berxî re hatibû. Li ser rê me li çend restorantan dîtibû ku li welatên Efrîqî goşt tîr nayê pi-



jandin. Li gor hin pisporan sedema li Efrîqayê emrê mirovan dirêj dewam nake, yek jê jî ev e. Piştî me hemûyan tîr xwar û vexwar, dor hatibû dans û reqsa ber muzîkên Efrîqî. Piştî demeke kurt me ê careke din fêhmî biki- ra ku li Efrîqayê danskirin celebê îbadet e û bi qasî birêveçûnê jî ji rêzê ye.

Bi karmendên otêlê re me wextek pir bi xweş derbas kiribû. Rêya me dirêj bû, hê gelek dever mabûn ku divê me bidîta. Nexşeyeke bi qasî metreyekê di dest me de bû û em hê li destpêkê bûn. Di rêwîtiyên bi vî rengî de gelek cih hene ku gava hûn çav lêkevin we serxweş bike û ew der nehêle hûn biçine devereke dîtir. Dive mirov pê nexape. Tim cihekî xweşîktir dê bê peydakirin. Û her cihê hûnê paşê bibînin, ji dilê xwe hûn ê bêjin baş e ku ez li wê derê zêdetir nemam û nesekinim. Mayin û neçûyina cihekî nuh ne karê serguzeştêkî, belkî yê evîndarekî/ê be. Heger em li Kli- manjaroyê zêdetir bimana, meyê Serengetî nedîtibûya...



Serengetî, berriyeke zêrîn î dipdirêj, çoleke tenha, warê ajal û balindeyên dirinde. Bi daxilbûna rêya dûz a bê fetlanok a berriyê, mirov xwe di nav seta belgefilîmeke safariyê de his dike... Di birçîbûneke rêwîtiyê de, ji ber ku li ser rê cihek tune bû ku mirov bikaribe xwarineke li gorî madê xwe peyda bike, çend pakêtên fisteq û findeqan mabû bi hevarekî re, me ew dixwarin. Jeffrey li ber direksiyonê jî xwest ji festeqan tam bike, min jî pakêta mayî ya festeqan dirêjî wî kir, piştî yek dudo jê xwarin ruyê wî tîrş bû, madê wî xeliya û pencereya seyarêyê vekir û ew ji devê xwe avêtin. Hê çend deqe neborîbûn ku babûnek (celebek meymûn e li Serengetiyê) rêya me birrî û em sekinandin. Wek gundiyeke mecbûr mabe û xwe avêtibe devê rê dest li me rakiribû. Piştî em lê sekinîn, ji aliyekî ve me kêfa xwe jê re dianî, ji aliyê din ve jî me ser xwe sax dikir bê ka tişteki xwarinê heye ku em bidinê an na. Ew festeqên bistka din madê Jeffrey xelandibûn me dirêjî babûnî kirin. Jeffrey jî bi miraq lê dinihêrî bê ka ew ê festeqan bixwe an na. Piştî bêhnekê babûnê me festeq yek bi yek vedikirin û bi şerpsêrpekê ew dixwarin, Jeffrey piştî ev tablo dît, behitî û got;

diyar e hûn xizmên hev in û em û babûn ne tişteki hev in!

Parkên neteweyî yên Tanzanyayê çendek in. Her yek ji bajarekî mezintir in. Ji van a herî mezin û a herî tê zanîn Parka Neteweyî ya Serengetiyê ye ku ew bi xwe jî berdewama Parka Masai Marayê ya Ken-yayê ye. Li vê derê qebîleyeke bi navê Masai heye ku li vê siruştê dirinde dijîn. Ne bi şikl û jiyana xwe, ne jî bi ziman û kultura xwe naşibihin ên derdora xwe. Digel ku zimanê gel ê Kenya û Tanzanyayê bi tevahî Swahilî be (zimanê sahilê) û li texma peravê rojhilatê Efrîqayê bê axaftin jî, Masaiyî zimanekî bi navê Maa dipeyivin ku ew jî bi ser malbata zimanên Nîlo-Saharan ve ye. Masai bi şêwaza jiyana xwe hêjayî naskirin û dîtîne ne, ev miletê qedîm ê vê berriyê her çi qas heyateke pir zehmet bijîn jî bi sedsalan ev çol ji xwe re kirine mal û stargeh.

Piştî rêwîtiyeke dirêj û şeveke nerehet li çola Nangwayê, ji ser çola Morogoroyê em gihaştibûn mezin-tirîn bajarê Tanzanyayê. Geştiyar ji bo xwe bigihînin girav û çola Serengetiyê, balafirgeha Darusselamê bi kar tînin. Bi Erebî navê bajêr Darusselam e, yanî bajarê aşitiyê, bi Swahilî jî jê re dibêjin bajarê seyranê. Di wê erdnigariya beyar û di wê kelegerma herwext de, bajar ji ber ku li kêleka behrê hatiye avakirin ev nav lê kirine. Navê bajêr bikirina “deriyê behiştê” dê bêtir lê bihata, ji ber ku deriyekî gewre ye ku ber bi medeniyet û azadiyê ve vedibe...

Ji Darusselam bo Zanzibarê du rê hene: yek jê ferîbota lezgîn e, ya din jî planora bi motor e, yanî balafira biçûk a 10-12 kesî. Bi planorê 15-20 deqe dewam dike ev serpêhatiya tirsnak û cihêreng. Heger hûn bi planorê biçin, hewce nake hûn mesrefeke din bikin ji bo çûyina nav bajêr. Me jî wisa kir. Piştî me seyareya Jeffrey li cihekî park kir, em bi planorê ber bi asîmanan ve hilkişîyan. Wekî em di kartonfilma “Clémentinê” de bin bê em li ber xwe dibirin û ger me xavikek hebûya dê xavik jî li ber bê li ba bibûya wekî dimenên kartonfilmê. Me tirs ew bû ku daxistina planorê ne wekî bi jorketîne rehet be. Bi çavgirtîneke dipdirêêêê û bi tirs em gihaştin balafirgeha Zanzibarê. Piştî vê firîna xeternak heger em li vê giravê mecbûrî bihurandina emrê xwe yê mayî bibûna jî dê veger ne bi vê planora xerxote bûya.


Zanzibar ji du beşan pêk dihat: aliyek jê peravê zeryayê ye ku ji gelek plajên mezin pêk tê, yê din jî bajarokê ku wekî paytexta Zanzibarê tê binavkirin, yanî Stone Towna kevnare ye. Zanzibar giraveke ew çend şêrîn e, çer ku mirov çav lê dikeve jê hez dike. Derûdor û qiraxên giravê ji plajan pêk tê, li nava giravê jî daristana biharatê ya herî mezin a cihanê hûn karin bibînin. Plaja herî navdar Nungwî ye li Zanzibarê. Em li Nungwîyê li otêleke bûtîk bi cih bûn. Li otêleke Zanzibarê tiştê herî ferz kule ye, yanî cîbînlik e. Ne ji kuleyê be kelmêşên giravê dikarin giyanê we bikojin. Şeveke otêlê li gorî mezinbûna odayê teqrîben di naveyna 50-100 dolarî de ye. Piraniya turîstan ji bo tûrên daristana biharatê tîn û di ber re jî li peravê Zeryaya Hindî bêhna xwe didin. Mirov bi rehetî dikare bêje ku li cihekî wekî Efrîqayê hûn li çî bigerin dikarin li vê giravê peyde bikin. Xweza, zerya, qûmeke spî boz, avahiyên dîrokî, mirovên dilgerm û helbet mala ku Freddie Mercuryê solîstê The Queenê lê hatiye dinyê, hûn dikarin bibînin. Zanzibar ji ber ku giraveke Zeryaya Hindî ye, li vir gelek seferên divingê tîn kirin. Bi keştiyeke bayî ya darîn ji girava Zanzibarê ber bi giravên biçûk ên derûdorê hûn dikarin xwe bera nav pêlên zeryê bidin û noqî avê bibin. Ev tûrên divingê ji sibê heta êvarî dewam dikin. Tevî xwarina nîvro ya bi jîndarên zeryayî heqê tûra rojekê bi 25 dolarî ye. Rojên ku med-cezîr hebe ava zeryayê bi qasî sed metreyî dikişê û zelaltir dibe, heger hûn nexwazin bi grûbê biçin, hûn dikarin tûpekî oksîjenê kirê bikin, bi şnorkel an jî berçaveke avê jî hûn dikarin jîndar û masiyên cûrbicûr ên bin avê bibînin.

Piştî çend rojên xweş ên li Zanzibarê wextê vegeerê jî hatibû. Dawî li tûrên nav daristana biharatê, li divingê, li xwarinên cûrbicûr ên zeryayî, li şevbuhêrkên ber peravê, li tûrên mîmarî û avahiyên dîrokî, li avjenî û li gelek tiştên din hatibû. Rêwîtiya Tanzanyayê bi qasî Hakûna Matatayeke ku wekî peyv tê wateya - kêşe nîne- rehet û bê arîşe derbas dibû. Ji bo vegera Darusselamê me yê ferîbot bi kar bianiya vê carê, Jeffrey me bêriya seyareya xwe kiribû, di wan çend rojên giravê de serê carekê ev pirsî bû: “Min ev pîkab bi hêsanî nekirî, hê teqsîtên wê neqediyane, gelo me ew li cihekî ewle park kir an na...”


Em di roja çendemîn de bûn nizamim, wexta min çavê vekir em gîhaştibûn Mombasayê. Wekî min di destpêka nivîsê de jî behs kiribû Mombasa bajarekî wisa ye ku ji çar qoran ve zerya ji nav diherike. Duyemîn bajarê mezin ê Kenyayê ye û lengergeha herî mezin a welêt jî li vê derê ye. Digel ku bajar ew çend ciwan e, bi qasî bedewiya xwe ew çend jî lewitî ye. Bajar wekî zarokekî di nav ax û gemarê de bi çavên xwe yên şîn ên xweşik li we dinihêre. Di şevên tarî yên vî bajarê xeternak de em gelek tiştên balkêş dibînin. Li bareke mezin a nav bajêr, wekî tasikên şekir ên li ber çayê, li ser her maseyê bo ewlehiya têkiliyên zayendî tasikên kîsikan (prezervatif) hebûn. Ji ber ku li welêt kesên bi vîrusa HÎV'ê ne, bi ser du milyonî ketine, dewlet jî bo welatiyan biparêze li her cihî kîsik(prezervatif) danîne. Roja dîtir gava em derdikevin bazarê, em bi tiştêkî balkêşî din dihesin, wexta em li nav bajêr digeriyan her kesên ku çav li me diket û didît ku em ne reşik in silava cihûyan li me dikirin: Şalom. Dema ji esnafekî em sedema vê yekê dipirsîn, dibêje, “ev der wekî naven-da perwerdehiyê ya saloxgerî ango istixbaratê ya Îsrailê tê bikaranîn, di rojekê de hûn gelek caran dikarin pêrgî gelek cihûyan bîn”.

Li hemû dikanên diyariyan ên Mombasayê peykerên ji daran hatine çêkirin tîn firotin, mirov van peykerên destkar ên ji fîgur û xetên ji serçavên reşikan hatine çêkirin, bi bihayên gelek kêr jî bo malên xwe dikirin.

Di roja dawî ya vegeerê de em têra xwe westiyayî li balafirgeha Mombasayê benda saeta firînê ne. Ji ber ku em bê walîz in, barê me sivik e. Bi vegera Stenbolê em giliyê xwe li Air Arabia dikin da ku mese-leya çenteyên me yên wendabûyî safî bike. Piştî çend rojan bersiv ji Air Arabiya digihêje me. Çenteyên we nehatin dîtin stop. Li hember çenteyên xwe yên wenda werin rahêjin pereyên xwe yên tazminatê stop. Heger hûn bixwazin doz li Air Arabia vekin hûn serbest in stop. Lê hûn nikarin tiştêkî ji vî heqî zêdetir bi dest bixin stop. Ji ber ku di girêbesta rêwiyan a ku di bilêt kirinê de hûn imze dikin de her tişt yek bi yek nivîsandî ye stop!



HEMA WÊNEYEKE MIN BIGIRE
Û JI POPKURDÊ RE BÎŞNE.
JI MIN XWEŞIKTIR Û DELALTIR
HEYE LI SER RÛYÊ ERDÊ ?!
E2 JÎ JI XWEZAYA WELÊT IM.
JI TOVÊ VÎ WELATÎ AFIRÎ ME.



NIVÎSKAR, QALA PIRTÛKA XWE YA
"MORANA Gerdûnê - Bayê Labûtê"
DIKE.



KEKÊ LABÛT QI YE?

BÎENALA MÊRDÎNÊ

û Hunermendên “herêmî”



4emîn Bîenala Mêrdînê di navbera 4ê Gulanê û 4ê Hezîranê de çêbû. Bîenal li mekanên cuda yên Mêrdîna jor hat kirin. Kuratorên Bîenalê Fırat Arapoğlu, Jale Gürlek û Derya Yücel bûn. Ji Tirkîyê û derve gelek hunermend ji bo Bîenalê hatin Mêrdînê. Di nav wan de kesên

wekî Ana Mendieta, Cengiz Tekin, Leyla Postalcıoğlu, Mustafa Avcı û Taner Ceylan jî hebûn. Di Bîenalê de gelek berhem hatin nişandan.

Di heman pêvajoyê de, hunermendên “herêmî” yên Mêrdînê û xwendekarê zanîngeha Artukluyê jî, li derveyî Bîenala Mêrdînê, bi îmkanên xwe xebatên xwe nişan dan. Ji bo vê jî ciwanan Counter Bînel û hin pêşaneyên din çêkirin. 14 hunermend tevî Counter Bîenalê bûn. Xwendekarên Zanîngeha Artukluyê û Hunermendê Counter Bîenalê Rıdwan Aşar, ji PopKurdê re peyivî. Rexne li Bîenala Mêrdînê kirin û got: “Hunermend û kesên ku Bîenal bi rê ve

birin, tu carî bi hunermendên li Mêrdînê re têkilî danenîn. Loma jî me xwest helwesta xwe bi Counter Bîenalê nişan bidin.”

Aşar wiha dibêje “ev Counter Bîenal ne fikr û xebata kesekî ye. Yê wêkî me difikirin, hemû di nav vî karî de hebûn.”

Aşar li ser helwesta hunermendên Bîenala Mêrdînê rexneyeke balkêş kir û wiha got: “Hunermendên Bîenala Mêrdînê, mixabin wekî alaveke bazarê li hunermendên “herêmî” û ciwan dimeyzînin.”

Aşar ev helwest bi xebata xwe ya bi navê “terazî”, li Counter Bîenalê rexne kir.

Aliyekî teraziyê hunermendên hoste, yê din hunermendên ciwan simbolîze dike. Di “terazî”yê de herdu alî jî wek hev in.

Bawer Doğanay û Mehmûd Akdemir jî telebeyên Zanîngeha Artukluyê ne. Ew jî xebatên xwe yên hunerî, bi derfetên xwe bi rê ve dibin.

Rexneyên wan jî hene li ser Bîenalê. Em çûn û me guh da wan.

Ew jî gazinan dikin ku çarçoveya Bîenalê teng bû û hunermend hemû ji derdorekê bûn.

Mehmûd dibêje “Hunermendên hatin vir, haya wan ji xebatên li Mêrdînê tên kirin



tune ne. Kuratoriya Bienalê tiştên ku ne bi dilê wan bû sansur kir.

Bawer jî diyar dike ku “Bienal xîtabî her kesî nedikir.”

Wan bi serê xwe li Mêrdîna jor, li malekê pêşane çêkir.

Bawer diyar dike ku “Helbet nîşandana hunerê ne tenê Bienalên din in, ji bo vê gelek alternatîf hene. Me pêşane çêkir, gelek kes hatin pêşaneya me. Di nav wan de hunermendên navdar jî hebûn. Berhemên ku li pêşaneya me hatin nîşandan ne kêmî yên Bienalê bûn”

Bawer û mehmûd dibêjin: “Me li gorî çavdêriyên xwe, rexneyên xwe bi xebatekê çêkir. Min bi kupeke spî rexneya xwe ya li ser Bienalê kir.



“Ez bi rastiye dizanim. Rasti ev e ku li ser ve rewşa min...rewşa ku anuha ez te de me, di nava min de şerek heye: şerekî di navîna min û nefsa min de, şerekî di navîna min û sûretê min de. Ez dibêjim qey min jî mîna Xwedê kiriye...dibêjim qey min jî ji rastiya xwe, sûretekî xwe çekiriye û di nava xwe de bi cih kiriye. Dibêjim qey ev şer, şerê min û sûretê min e...şerê min û sûretê nefsa hundurê min e.”

Hesenê Metê

Gotinên Gunehkar,

(Weşanên Avesta, rûpel: 139)

BI GANÎ MÎRZO RE ROPORTAJ

“MUZÎK ‘ILMEK E. LAZIM E MIROV BIXWÎNE, SERÊ XWE PÊ BIÊŞÎNE”



GANÎ MÎRZO :

**“HIN KES,
BÊ SARÛÇAV
Û BÊ XWENDIN,
MUZÎKA XERBÎ
TEVLÎ YA ŞERQÎ DIKIN”**

“Mihemed Bilen ji bo POPKURD`ê çû Kat-alonyayê û bi Ganî Mîrzo re roportaj kir.”

Tu dikarî pariyekî behsa serboriya xwe bikî?

“Ez di salên 1987-88an de li Helebê xwendekar bûm. Wê gavê du rê li ber min hebûn. An ez ê biçûma Elmanyayê û ez ê li ser muzîka klasîk bixebitayim an jî ez ê bihatama Spanyayê û min ê berê xwe bida flamenkoyê. Mûzîka klasîk zêde bala min nedikişand. Meyla min li ser muzîkên hîperaktîv bû. Ji nav mûzîkên Ewropî jî, herî pir Flamenkoyê bala min dikişand. Min li Spanyayê, di beşa Flamenkoyê de 6 salan konservatuwar xwend. Rîtm û awaza wê jî gelek dişibiya ya mûzîka Kurdî. Wek ku qereçiyên Kurdistanê, li Spanyayê ev muzîk dikirin. Qereçiyên Kurd di muzîka Kurdî de gelek serkeftî ne. Qereçiyên Spanî jî li vir flamenkoyê dikin û ew jî wilo serkeftî ne.”

“hin kes, bê sarûçav û bê xwendin, mûzîka xerbî tevli ya şerqî dikin”

Ev gelek sal in tu ji welêt dûr î. Gelo ev yek, çi li muzîka te kêmkirî an jî çi lê zêde dîke?

“Him zêde dîke him jî kêmkirî. Dûrbûna welêt, dûriya ji nas, dost û malbatê, bi rengê xwe dixê nav mûzîka me. Li van deran derfet bêhtir in û ev jî helbet perspektîfa muzîsyenan firehtir dîke. Lê car caran ev dûrî, tesîrên xirab jî çêdikin. Mîsal hin caran hin kes, bê sarûçav û bê xwendin, mûzîkên xerbî tevli ya şerqî dikin û berhemên xirab çêdibin. Tesîreke xirab a din jî ev e ku mirov dûrî milletê xwe ye. Heke em li Kurdistanê bûna me yê di nav xelkê xwe de konseran çêkîra, em ê bêhtir di hev de bigeriyana.”

Heta niha çend xebatên te hene û tu bi kê re dixebitî?

“Heta niha min 4 albûm derxistin. Yek ji wan, albûma mûzîkên şanoyan e. 3 komên me hene. Di yekê de hunermendê Kurd-Ermen Brahîm Kêvo heye. Em pê re bêhtir li ser Flamenkoya bi Kurdî dixebitin. Herwiha bi wî re em li ser helbestan xebatekê dimeşînin. Wekî din di komên me de jî gelek welatan hunermend hene.”

Têkiliya te û mûzîsyenên Katalan çawa ye? Gelo projeyên we yê hevpar hene?

“Têkiliya min bi wan re gelek xurt e. Di koma me de muzîsyenên Katalan hene, em

bi hev re lêdidin û dibêjin. Çend sal berê xebateke me ya li ser mûzîka şanoyekê hebû, ez bi Katalanan re dixebitîm. Pir serkeftî bû, gelek xelat girtin. Niha jî projeyekê me ya nû heye. Me komeke nû ava kir. Ne tenê Katalan, Baskî jî tê de hene. Herwiha jî Ûrûgûay, Meksîka û Argentînê jî mûzîsyen hene û em ê bi gelek zimanan stranên çêkin.”

Kijan mûzîsyen tesîr li te kirin?

“atmosfera diwanên dengbêjan ket nav rih û damarên min”

“Di zaroktiya min de Radyoya Yêrîwanê hebû. Pîr kêfa min ji stranbêjên ji wir re dihatin. Mihemed Arif Cizîrî, Seîd Axayê Cizîrî û hwd.

Herwiha Şakiro, Miradê Kinê, Seîd Yûsiv, Mihemed Şêxo û gelekên din tesîr li min kirin. Dema ez biçûk bûm, bavê min ez dibirim diwanên dengbêjan. Ew atmosfer ket nav rih û damarên min.

Piştî ez ketim konservatuwarê, min mûzîka Paco de Lucia nas kir. Ew ji bo min gelek cuda ye.”

Tu li vir dikarî bi muzîkê debara xwe bikî gelo?

“Na. Çimkî li vir rewşa ekonomîk ji bo hunermendan ne pir baş e. Ez jî di nav de, gelek muzîsyen di ber re karên din jî dikin. Helbet debara min jî zor dibe. 10 salên ewil di nav zor û zehmetiyê de min karê muzîkê dikir. Heke haya Kurdan ji hunermendên wan hebûya, helbet wê debara wan rihettir bûya. Lê heyf ku Kurd guh nadin nivîskar û hunermendên xwe, haya wan ji çand û hunera wan tune ye.”

Tu di hin projeyên sivîl de jî kar dikî. Dikarî ji me re behs bikî?

“Rast e. Teqriben 10 sal berê dest pê kirin. Li Elmanyayê her sal festîval çêdibûn. Festîval, her sal li ser muzîka welatekî çêdibû. Me ji wan xwest salekê li ser muzîka Kurdistanê jî ev festîval bê kirin. Zehmet bû lê wan qebûl kir û me li ser muzîka Kurdî li Elmanyayê festîval çêkir. Gelek hunermendên Kurd hatin. Ew hefte, ji bo min kêf û bextirayeke mezin bû. Piştî re ez bi wan re peyivîm. Min go “gelo em dikarin vê festîvalê bibin Kurdistanê. Piştî xebat û hewldanan, me li Hewlêrê ev festîval çêkir. Ji gelek welatan hunermend hatin vê fes-



tîvalê. Tiştên bi vî rengî ji bo nasandina çand û hunera miletekî pir muhîm in. Lazim e bêhtir bên çêkirin.”

Ez bawer im li ser ciwanên Kurd jî projeyeke te heye ne werê?

“Belê. Şerê li Sûriyê tesîreke pir xirab li ser zarokan çêkir. Me go gelo em çawa dikarin xizmeta wan zarokên Kurd ên bala wan li ser muzîkê bikin. Niha me ji sedî zêdetir enstruman berhev kirin. Em ê însallah ji wan zarokan re bişînin. Ji bo zarokên me dîna xwe bidin ser mûzîkê em ê van xebatan bikin.

Herwiha dilê me heye em li Rojava festîvaleke navdewletî bikin. An li Qamişloyê an li Kobaniyê em dixwazin tişteki halo çêkin.”

“muzîk ‘ilmek e. Lazim e meriv bixwîne, serê xwe pê biêşîne”

Em werin ser mûzîka Kurdî. Li gorî te rewşa mûzîka Kurdî çilo ye? Ber bi erebeskiyê ve diçe û an dirûveki modern digre?

“Beşek ber bi erebeskiyê ve diçe. Li Tirkîyê demeke dirêj mûzîka erebesk gelek populer bû. Kurdan jî tesîr ji vê girt, heta ev kopî kir. Beşeke din jî bala xwe didin ser

Cazz, Blues, Pop û Flamenkoyê. Lê meseleya muhîm ev e; muzîk ilmek e. Lazim e meriv bixwîne, serê xwe pê biêşîne. Divê bingeha mûzîkê baş bê avakirin ku berhemên baş derkevin. Herwiha stranên Kurdî roj bi roj ji helbestên baş dûr dikevin. Şa’îrên wek Evdîla Peşêw, Şêrko Bêkes lazim e bikevin nav stranên Kurdî.”

Haya te ji mûzîsyenên ciwan ên Kurd heye?

“Erê, helbet ez wan dişopînim. Hin ji wan gelek bala min dikşînin. Yên karên baş dikin hene lê piştgirî ji wan re lazim e. Lê hin ji wan tenê di studyoyê de dixebitin û mûzîka xwe dikin. Huner wiha pêş nakeve, lazim e ji studyoyê derkevin. Mûzîsyenên jin kêmin di mûzîka Kurdî de. Yên hene jî nav û dengên wan belav nabe. Divê em di vî warî de desteg bidin jinên Kurd.

Hunermendên Kurd û xebatên wan dê çawa bên nasandin? Ti peşniyaza te heye weki din?

“Di vir de rola medyayê muhîm e lê mixabin medyaya Kurdî di vê meselê de gelek qels e. Ti ehemmiyetê nadin çand û hunera Kurdî. Bernameyên ku tên çêkirin ji aliyê naverokê ve gelek xirab in. Lazim e em medyaya cihanê ji xwe re bikin emsal.”



KENÊ MIN NAYÊ!

Özge SÜER | ozgesuer2@gmail.com

*Apê Freud dibêje “Ew kesê/a ewilîn ê ku ji dêvla şer bike, sixêf kirine avakerê/a medenîyetê ye” ji ber wê jinên Mêrdînî pirr xweş xeberan didin.

**Keçik dibê dayik heyranê
Bişîne pey lawikê Metînî delalê malê
Heger tê min dixwaze bila bê min bixwaze
Heger min naxwaze sibê dîsa mesaî heye.”

*Ji kerema xwe re zilamên nikarin mirîşkekê ser jê bikin bila dawa kutilkan li me nekin. Hûn jî aîdî vê serdemê ne, em jî. Ku dilê we dihere kutilkan herin bi pîrika xwe re bizewicin.

*Dibe hûn pê dikenin lê mijara bacan û fringiyan mijareke pirr dilsoj e. Sibê dusib xwesiya min ji min re bêje “Qîza min ka ji dolabê bacanan bîne” û ez jî herim – ji qewlê toriyan – bacanên reş bînim ber wê, a ji te re ji bela dewlemendiya Kurdî mala min û peyê min ji dest min çûn!

*Tevî ku ewqas helbest û stran hene, xortê Kurd ê belengaz bi heman hevokê dimeşe sê keçikan û di ser de jî gazinên xwe ji tenêbûnê dike. Qet nebe te hebki serê xwe biêşanda berxikê ca xwe..



AWAYÊN POPULERBÛNA

MUZÎKA KURDÎ Û ÇEND TESPÎT

Besîme ŞEN | besimesen@yahoo.com

Hemû cureyên muzîkê yên li ser rûyê dunê, naxwazin ji derfetên populeriyê paşda bimînin. Çimkî dizanin ku tu populer nebî, tu yê 'wekî tune bî' bêyî hesabandin! Ezê îdîa bikim ku bingeha maddî ya ku evê yekê pêk tîne, di roja îro da pevrabûna 'internet û telefonê' ye. Muzîk bixwe li aliyekî, êdî hemû inovasyon, yanî tiştên nû li gorî telefon û bikarhênerên wan têne çêkirin. Yanî muzîk, sînema û gelek şaxên hunerê yên din li gorî pevkariya telefon û internet têne çêkirin. Tiştên ku derveyî vê qadê dimînin sînor û bandorên wê kêmbin, heta tenê bi eleqeya zumreyeke elît va tên sînordarkirin.

Populerbûna muzîkê, rewşeke ku bi temamî girêdayî şert û mercên maddî yên bajarbûn û teknolojîyê va girêdayî ye. Populerbûn, meseleyeke ku ji muzîkê wêdatir, li gorî pêdiviyên nesnel-maddî yên ku ew dorpêç kirine dîyar dibe./çêdibe. Yanî bi kurtayî meriv dikare bêje ku kevneşopîya muzîkên klasîk yên dewletên netewî jî di nav da, hemû cureyên muzîkê û hemû hunermend dixwazin populerbin. Çimkî kes naxwaze 'wekî tune ye' bê hesabandin. Hunermend û berhemeke hunerî ya ku meriv bi rêya aplikasyoneke telefona nikaribe bigihîjê, herwekî tune ye! Kurd û muzîka Kurdî di vî warî da xwedî hinek îstîsnayên. Ev, bi rewşa wan ya polîtîk û sosyolojîk va têkildar e! Ev nivîs wê dîyardeya li ser muzîk û muzîkjenê Kurd , Emê di vê nivîsê

da hewlbidin bi kurtasî li ser muzîk û muzîkjenê Kurd çarçoveyekî derxine meydana.

Kurdan, ji ber bêdewletiyê û zextên sîyasî nikaribûn sazîyên xwe yên muzîkê ava bikin. Sazîyên ku ava bûn jî, ji ber tirsên sîyasî domdar nebûn û ewqasî politize bibûn ku naveroka stranan diguhertin. Loma jî meriv dikare bêje ku di dema modern da, muzîka Kurdî 'bê îstîqrar' bû û 'yekrû û domdar' nebû. Ev faktorana di qada hunera modern da, bûne sedema lawazmayîna sermîyanê çandî yên Kurdan. Him di çavkanîyan da him jî di repertuaran da hîn şopên serdema kasîk têne xûyan. Di referans û pênaseyên muzîkê da bi piranî tesîra dengbêjîyê tê dîtîn. Ew muzîkjenên ku ji vî qaydeyî derdikevin û tiştên cudatir diafirînin, yên dema modern temsîl dikin jî di bin tesîra faktorên din da asê dimînin.

Di heyama nû ya muzîka kurdî da, yanî di wan demên ku dînamîkên wek teknoloji û bajarbûnî/bajarvanî faktorên sereke bûn, ji muzîkê wêdatir muzîkjen derketibû pêş. Yanî starbûn! Hunermendên wek Şivan Perwer, Nizamettîn Arîç, Ciwan Haco digel cudabûnên girîng yên çax û terzê muzîka xwe, muzîka van hersê hunermendan gi-hîşte Kurdên her aliyê dunê û populer bûn. Lêbelê beriya vê starbûnê radyo hebûn û ev radyoyan bûne sedema naskirina muzîk û muzîkjenê Kurd û radyo di naskirin û belavkirina muzîka kurdî da bû merheleyeke

giring. Radyoyê ji Kaset-CD û televizyonê zêdtir dewam kirîye.

Bi saya radyoyê haya Kurdên li herêmên cuda ji hebûna hev û ji muzîka hev çêbûye. Heyama TV-kasetê jî, teqabulî bi polîtîzebûn, hêz û avakirina sazîyên xwe dike. Di vê heyamê da dîsa bi tesîra faktorên polîtîk ev hêza polîtîk û ev sazî temirîne. Em dikarin bêjin ku wexta dewletê bi zextan muzîka Kurdî qedexe dikir û muzîsyenê wê sirgûn dikirin; partîyên Kurdan jî huner û çanda Kurdî zêde polîtîze û bê îstîqrar dikirin. Yanî populerbûna muzîkê, derveyî sîyasetê nîne.

Alîyekî populerbûna muzîk û muzîsyenê din jî sosyolojîk e. Hebûna civaka Kurdan a qedîmî ya li ser erdê xwe, qasî ku tê zanîn ji ber sedemên polîtîk carna hêdî carna jî zûbizû belav bûne. Kurd xaseten li seranserê Tirkîyê bûne karkerên 'bê wesif'. Kurdên ku hertim ji alîyê Tirkan va weke 'karkerên însaetê' têne dîtin, hindik be jî di însaetê da bûne karsaz. Lêbelê endamên malbata karsaz yên mayî, dîsa weka karkerên însaetê man û bi erzanî dixebitîn, pê qayîl dibûn. Ev rewşa trajîk hê jî berdewam e.

Faktora duyemîn jî teknoloji ye, yanî gihîştina 'internet û telefona destan' (bikaranîn û xwedîbûna wan).

Qaydê telefonan çî dibe bila bibe, kesên ji hemû çîn, sinif, û kulturên bi awayekî hêsani dikarin bigihîjine van telefonên destan. Ji bo bikaranîn û gihîştina hemû cureyên teknolojiyê û xasma jî telefonên destan, kesên ji hemû tebeqeyên civakê dibine xwedîyê derfetên bêserûbin herwaha dikevîne bin deynên giran. Çi Afrîqayî çî Ewropayî çî Asyayî çî Kurd çî Tirk, kê dibe bila bibe, herkes ji me dixaze bibe xwedî telefoneke destan. Ji ber ku teknolojiya eşyayên nava malê ne têda, em dikarin bi tikeke telefonê bigihîjine hemû derfetên teknoljîk. Ez dixwazim gotinê bînim ser vir. Hilberîn, çêkirin, belavkirin, danasîn û agahîyên li ser muzîk, sînema, TV û hemû cure hunerên din ji endustrîya xwe ya serbixwe qut dibin, dikevîne hundurê telefoneke destan.

Muzîk êdî ne ji bo muzîkê bi xwe, ji bo pêdiviyên endustrîya TV û sînemayê tê çêkirin. Ev rewşa bi giştî vî qaydeyî dewam dike. Ev endustrîyana jî mecbûrin ku têkevîne nava aplîkasyonan û hema bêje ev aplîkasyon jî mîna teknolojiya telefonê her roj diguherin. An na wê 'wekî ku tune bin' werine hesabandin. Muzîk û muzîsyenê Kurd, di şertên normal de 'tune' ne, lê gelo di nava vê reqabeta teknoljîk û hehelê da rewşa wana çî ye?



“hilberîna rojane- destxistina wesfên performatif- gîhandina bi awayekî rasterarst bo guhdarvanan”

Dengbêj an jî hunermendên din ên muzîka klasîk a Kurdî, tên egzotîzekirin an jî romantîzekirinê. Meriv dikare bêje têne marjînalîzekirin jî. Aqubeta muzîk û muzîsyenê ku nekeve tîlefona desta, ‘marjînalbûn’ e. Ew albumên ku hunermend bi xebatên resen çêdikin, qedrên wan kêr dibin. Di nava van albuman da belkî çend heb stran bi awayên performatif, li ser medyaya civakî bi terzekî deformekirî belav dibe. Kirîna CD û tiştên wisa, hate jibîrkirin. Li gor çavdêriyên xwe dizanim ku hunermendên Kurd li hemberî vê realîteya nû çî zehmetîyan dikişînin.

Bi kurtayî em dibine şahidê guhertineke radîkal ya ku meriv dikare weke ‘xilasbûna/dawîya staran- hîlbûn/bilindbûna tarzê ji rêzê” binav bike. Ji aliyê Kurdan va parametreyên vê wahanin. Li Tirkîyê nîfşê nû yên Kurdan ên vî 30 salên dawî, pêşiyê ji Nizamettîn Arîç dûr ketin/ qut bûn. An jî meriv dikare ber eksê vê bêje; pêşiyê Nizamettîn Arîç ji wan dûr ket. Paşê Şivan Perwer ji guhdaran dûr ket, ewî jî xwe bi guhertinên teknolojîk ra nedigîhand. Herî dawî jî Ciwan Haco. Nîfşê nû û guhdarvanên muzîka klasîk ya Kurdî jî hêdî hêdî ji Ciwan Haco dûr dikevin. Ciwan Haco, li gorî starên Kurd ên din zêdetir ‘nêzik’ e, zêdetir jî tiştên nû ra vekirî ye -belê jî ber sedemên şexsî- ew di vê serdemê da bi avantajtir e. Ne jî ber ku muzîka wî baştir an jî moderntir e.

HÊSANBÛN!

Ji bo ku meriv populer bibe, wesfa herî girîng hêsanbûn e. Hingî ku star ji guhdarvanan dûr diketin, ev dûrketin bi tarzê jîyaneke cudatir dibû xwedî wate. Star ji herkesî cudatir bûn. Meriv nizanibû bê ka di taştê da li ser sifra wî çî heye. Ku em hînbûyana jî, ne ji lewzê devê wî, em ji mêvanên wî an jî rojnamevanan an jî ji wêneyan hîndibûn. Lê muzîsyenê populer ên vê demê ji xwarin vexwarina xwe bigire heta kincên ku li xwe dike, her tiştê jîyana xwe ya rojane, li ser hesabên xwe yên înternetê bi guhdarvanên

xwe ra parvedike. Heta ev prezentasyon/pêşkêşî ji kalîteya muzîka wî pêşdatir e. Tiştê skandal weşandina muzîkeke xirab nîne, weşandina wêneyeke xirab a li ser hesabê întagramê ye.

Sedemên asêbûna civaka Kurdan a di sosyolojîyêke girtî da, meriv ancax bikaribe bi sedan rûpela bîne zimên. Muzîk û muzîsyenê Kurd, di vê sosyolojîya girtî da, di nava civaka xwe bixwe da populer dibe û tê nas kirin. Bo mînak meraq û eleqeya Tirkên li Tirkîyeyê ya li ser muzîk, muzîsyen û çanda Kurdan pir kêr e. Ev yek di jîyana rojane da jî, di qada entelektuelî û polîtîk da jî wisa ne. Tirkek muzîka Kurdî meraq nake.

Gelo sedema vê bêeleqebûn û dûrbûnê jî polîtîk e? Têspîteke waha, ya ku ji hêla sosyolojîya kulturî va tê kirin, girîngiya wê ya ji aliyê netîceyên xwe va evî tiştî derdixê pêş; Kurd, Bêyî ku guh bidin xelkên din ên heman welatî û helwesta îqtîdaran; divê ku jî bo xwe, jî bo muzîk û muzîsyenên xwe sazî û mekanîzmayên mayînde ava durust/ava bikin. Lê tiştê ferz divê ev sazî û mekanîzma ji wesf û armancên polîtîk wêdatir xwedî wesfên cihanî bin. Yên ku ne xwedî wesfên cihanî bin, aqubeta wan xilasbûn e an go tîk çûn e. Ji bo muzîk û muzîsyenê Kurd bikaribe derkeve asteke din, tiştê ku hewce dike, cihanîbûna muzîka klasîk û ya populer e.

Li şûna encamê; hê jî gelek zehmet e ku muzîka Kurdî û muzîsyenên Kurd ji nava civakên Tirk-Ereb û Farsan derkevin, populer bibin û bi nasnameya xwe, li cihanê xwe nîşan bidin. Ya duduyan, Kurd jî wekî herkesî bi telefonên destan dixwazin bigihîjine muzîka xwe. Ferqa wan û yên din, hê jî dibistanên wan ên muzîkê yên ku bi rengê xwe avakirine tune ne; festîvalên domdar û salonên xwe yên konserê; platformên ên ku wan bîne ba hev tune ne. Ya herî girîng jî derfetên maddî yên ku piştgiriyê bidine muzîk û muzîsyenê xwe, wan xurttir bike tune ne. Kesên bi mexsedê û evî jî xwe ra tîxe xem jî tune ne. Ji bo dilê me pê xweş be dikarim bêjim ku muzîka Kurdî hê jî gelekî xurt û dewlemend e.



loading...

ROZERÎN TADIK | tadikzerrin@gmail.com



Deniz Aktaş dibêje “Ev mekan cihê hunandina dîrok û gotinê ye.”

Loading, navenda hunera hevçax e, ekîba wê ji çar kesan pêk tê. Şansê min heye ku diduyan ji wan dibînim li Loadingê; Deniz aktaş û Cengiz Tekîn. Şener Özmen jî di ekîbê de ye lê ew li derveyî welêt e. Em bi Cengiz Tekîn û Deniz Aktaş re li maseyeke fireh û rihet rûdinin. Dixwazim bi kurtasî qala ekîbê bikim ji we re.

Erkan Ozgen: hunermendekî Mêrdînî ye. Li Zanîngeha Çukurovayê beşa wênesaziyê qedandiyê. Xwedî xebatên vîdyoyî û pêşengehan e. Di Bîenala Stenbolê ya 15mîn de, vîdyoya wî ya bi navê Wanderland-Harikalar Diyarî- hat nîşandan û temaşevanan jî gelek ji vîdyoya wî hez kir.

Şener Ozmen; ji Hezexa Şîrnexê ye. Hunermend, rexnegirê hunerê û nivîskar e. Ji beşa wênesaziyê ya Zanîngeha Çukurovayê mezûn bûye. Berhemên wî li gelek deverên cîhanê hatine pêşandan.

Cengiz Tekîn; Diyarbekirî ye. Ew jî weke Özmen û Özgen beşa Wênesaziyê ya Zanîngeha Çukurovayê qedandiyê. Xebatên wî yên vîdyo û wêneyan hene. Vîdyoya wî ya bi navê ‘Just Bêfore Paradîse’ li seranserê cîhanê hat temaşekirin.

Deniz Aktaş jî ji Diyarbekirê ye. Li Zanîngeha Marmarayê, beşa Wêje û Hunerê xwendiyê. Li welêt û derveyî welêt di gelek projeyan de berhemên wî yen cur bi cur hatin nîşandan. Di Bîenala Mêrdînê ya 3yemîn de berhema wî ya bi navê “Bir Nar Gibi Dağılırken Belek” hat nîşandan.

Hevaltiya vê ekîbê ji zû ve ye dest pê kiriye û li ser hunerê jî dostaniya wan qaîm bûye.

Bi fikra 'Hebûna Mekanekê Baş e' Loading bûye devereke hunerî û dîrokî.

Bi kurtasî Loading dixwaze van bike;

- Arşivkirina pratîkên hunera hevçax ên li Diyarbekirê.

- Çêkirina rêzeçalakiyên danûstandinê li Diyarbekirê.

- Piştgirtina hunermendên li herêmê.

- Avakirina kitêbxaneya hunera hevçax.

Ji roja ku hatiye avakirin û vir ve, li Loadingê 18 çalakî hatine kirin. Atolye hatine avakirin û xwe gihandina dînamîkên herêmî. Loadingê bi pîrsa "gelo ji bo bajêr, di warê hunerê de em dikarin çi bikin?" serî eşandiye. Ji bo xwendekarên lîseya hunerê bûye îlham û destegê dide wan ciwanan. Xwendekarên lîseya hunerê bi saya Loadingê cara yekem, him Stenbol dîtin, him jî çûn atolye û pêşangehan. Dîsa bi xêra Loadingê du ciwanên xwendekarê lîseya hunerê, li Stenbolê beşdarî Bîenala zarok-ciwanan bûn.

Di heman demê de têkiliyên Loadingê yê navnetewî jî hene. Ji ekîbê Şener Özmen, niha li derveyî welêt dijî. Ji wir piştgirî dide Loadingê. Li mekan, him ji bo kesên ji derveyî welat tên, him jî ji bo mêvanan odeyeke Rezîdansê heye. Hunermend li gorî dilê xwe vê odeyê bi kar tînin.

Ekîb niha ji bo avakirina arşivekê, bi hemû derfetên xwe dixebite.

Ne mekaneke kolektîf e, ne jî bi sîstema galeriyê dixebite ev mekan. Li vî mekanî gotin û tarîx tê avakirin.

Qehweya bi filtre tim hazir e. Loading, li benda pêşniyaran û piştgiriya jî.



Tlf: +90 (412) 229 02 06

Adres: Kooperatifler mah.

Cahit sıtkı tarancı sokak,

aslan apt. Kat:1 daire no: 3

Yenişehir/ Diyarbakır/TR



POPirs

Alan Ciwan, di sala 1990î de li Batmanê çêbû. Di sala 2005an de li Batmanê dest bi karê şanogeryê kir. Di 2009an de çû Stenbolê û xebatên xwe yên hunerî bi zimanê xwe yê zikmakî -Kurmancî- berdewam kir. Bi lîstika xwe ya bi navê “Di Tuwaletê De” di warê lîstikvanîyê de, çendîn xelatên girîng wergirtin. Ciwan ji bilî şanoyê herwiha bi salan e ku li ser dublaja Kurdî jî kar dike û di sala 2017an de jî pêşkêşkariya werzê yekem ê Kurd Idolê kir.



1-Peyva ku tu herî zêde jê hez dikî?

Bê mane

2-Tu dikarî kêliya xwe ya herî bextewar ji me re bêji?

Her kêliya ku kutilk û tirşik lê hebe.

3-Tehemula te ji çi re tune ye?

Ji durûtî û sûşiyê re.

4-Te li vê dinyayê herî pir dixwest kê nas bikî?

Sadiq Hidayet

5- Xeyala te ya herî mezin çi ye?

Wek Apê Cemşîd Xan xwezî bayekî ez jî di ber xwe re bibirama.

*Ji romana Bextiyar Elî -Apê min Cemşîd Xan ku hertim bê ew li ber xwe dibir

6-Bi xêra xwe hevokeke ji strana ku herî zêde jê hez dikî bibêje?

Min şepolî şet bawesit kenar

Dême kenarit mest û bê qerar

Hani Mojtahedy- Şepol

7-Çi kenê te tîne?

Rewşên absûrt.

8-Dengê ku tu herî zêde jê hez dikî?

Xweza bê çi, ew e.

9- Heke cardin bihatayî dinyayê, te yê çi tiştî cardin bikira?

Şano û terka Tirkîyê.

10-Tiştê ku îlhamê dide te çi ye?

Hebûna rengê şîn.

11- Dîmeneke çawa te aciz dike?

Her dîmena ku bextewarî jê kêr û hêvî jê dîr e.

12-Te dixwest tu li ku derê bijî?

Aniha ciyê lê me xweş e. Nabêjim.

13-Qisûra te ya herî mezin çi ye?

Vê pêlê bêxemiya min.

14-Tu dixwazî çawa bimrî?

Ji kêfê.

15- Dixwazî çi li ser gora te bê nivîsandin?

Ji kêfê mir.



DENGBÊJ ZAHIRO: DENGBÊJIYA BERÊ NEMAYE!

Salihê Kevirbirî | salihkevirbirî@gmail.com



Salihê Kevirbirî



Dengbêj Zahiro (Zahir Koçu) yek ji wan dengbêjên me yên ‘zor’ e ku li çarwendorê welatê me tê nasîn. Bi rastî jî, ev ciwanmêrê hanê, dengbêjekî wisa ye ku li dora 35-40 sal in navê xwe di nava

lîteratûra kilam û stranên klasîk de daye qebûlkerin. Mirov dikare navê Zahirê Dengbêj, piştî Dengbêjên bi nav û deng ku çûne rehma Xwedê; Reso, Şakiro, Hacî Evdilkerîm û Hiseynoyê Orginosî yê Mûşî bîne zimên. Her wisa mirov dikare wî, di nava kelepura stranbêjiya Teyîboyê Sêrtî, Salihê Qûbînî, Salihê Bêynatî û Mehmûd Qizil de bide nîşandan.

Zahirê Dengbêj, di sala 1950’yî de li Diyarbekira Xopan çavên xwe ji jiyana deng û awaza kurdewarî re vekirîye. Hê di 15 saliya xwe de, tevî malbata xwe, ji Diyarbekirê derketiye û berê xwe daye Kopa (Bûlanix) Mûşê. Ew bi xwe ji Gundê Kinyada Farqîna Diyarbekirê ye. Li gorî gotina wî, zarokatiya

wî li Kinyada Farqînê; xortaniya wî li Bûlanix Mûşê derbas bûye.

Ev 30 sal in ku Zahirê Hosteyê dengbêjiyê li Rojavayê Tirkiyeyê, li bajarê Aydinê keferata jiyanê dike û hewl dide ku deng û awaza kurdewariyê, li vê derê û ji vê derê bilind bike. Dengbêj Zahiro, bavê deh zarokan e. Bi eslê xwe ji ‘Eşîra Bekirî’ ye. Li gorî gotina hosteyê me, ev malbat, malbateke pir mezin e û li seranserê welêt û Tirkiyeyê, li bajarên wekî Diyarbekir, Batman, Stenbol, Mêrsîn, Antalya, Bûrsa û Aydinê belav bûye.

Li Stenbolê û li bajarê Aydinê çendîn car me hev dît. Cara paşî gava li Stenbola Xopan em rastî hev hatin, piştî xweşbêşiyê ‘kilamî’ me pirsîbû, Dengêj Zahiro bersivandibû. Bi bersivdayînê re nemabû, destê xwe biribû ber guhê xwe, bi sê denga ji me re bi têra xwe kilam jî gotibûn....

Li ser pirsê min a “Mamê Zahir, roja ewil te çawa dest bi kilamgotinê kir? Te li kîjan civatê, kîjan kilam gotin?”, piştî ponijîneke



kurt wiha gotibû: “Li derdora 20 salî bûm gava min li civatan kilam gotin. Kilama ku min roja ewil gotiye û heta niha jî dibêjim kilama ‘Heso û Nazê’ ye. Ev 50 sal in ku ez kilaman dibêjim. Paşê min kilamên Mamoste “Reso” û kilamên Xwedê jê razî ‘Evdalê Zeynikê’ gotine. Helbet min kilamên xwe jî gotine û hê jî dibêjim. Ez bi gelek dengbêjan re jî geriyame.”

“Hoste û rêberên her dengbêjî hene. Gelo hoste yan hosteyên Zahirê dengbêj kî ne?” Li ser vê yekê jî bersiva wî bi têra xwe balkêş û hewqas jî qewîn û jixwerazî ye: “Ez şagirtê tu dengbêjekî nîn im. Ez xwe wekî şagirt nadim qebûl kirinê. Ez neçûme ba tu dengbêjan û min ji wan nexwestiye ku stranekê bibêje ku ez jê hîn bibim. Lê wekî şêwaz, rêbaz û deng min ji xwe re Reso wekî pîr û hoste qebûl kiriye. Min Evdalê Zeynê nedîtiye, min Şêx Silê nedîtiye lê min Ferzê dît. Ferzê pir pêşketî bû. Reso şagirtê Ferzê ye. Ez neçûme ba tu dengbêjan û min ji wan re negotiye; ‘ezê ji te stran, kilam û baciyan hîn bibim.’”

Ez bi Reso re ketime şerê kilaman!

Wî bi gelek dengbêjan re kilam gotine û şevbihûrk derbas kirine. Kerem bikin bila ew bixwe behsa vê bike: “Ez bi Reso re jî ketime şerê kilaman! Lê hemû dengbêj, -bi taybetî jî Reso- taca serê min in. Hemû jî ji min çêtir in. Lê rehma Xwedê lê be, şêwaza

Reso bi min xweş dihat. Dengê rehmetî pir xweş bû.”

Ji sohbeta me çend pirs û bersivên dûvedirêj, ezê di vê nivîsarê de bi kurtayî wiha bidim...

Kilama Heso û Nazê ji aliyê kê ve hatiye çêkirin?


Ji aliyê Mistefayê Heyran ve hatiye çêkirin. Ew ji Elaşgirê bû.

Tu dikarî navê çend dengbêjên xas û baş bidî hinekî behsa taybetmendiyên wan bikî?

Evdalê Zeynê pîrê degbêjan e. Piştî wî Şêx Silê û piştî wî jî Ferzê û piştî Ferzê Resoyê Gopala an jî Resoyê Qilîwelo û piştî wî jî Mistefayê Heyran. Heta tê gotin Reso bi Mistefayê Heyran re ketiye ber hev û sê şev û sê rojan Reso tenê du hêk û îskanek şîr vexwariye û di dawiyê de bi gotina kilama Metê cihê Mistefa jê standiye û ketiye pêş.

Şahidê Reso hene ku çavên wî di xewê de, dîsa kilam gotine. Ango razayî kilam gotine. Şakir jî heta ku tu bibêjî dengbêjekî baş û hêja bû. Dengbêjekî hok bû. Ez dikarim bibêjim hem şagirtê Reso bû û hem jî ne şagirtê wî bû. Piraniya kilamên wî yên Reso bûn. Hiseynê Orginosî şagirtê Sidîq bû. Dengê wî pir zelal bû.

Ez dikarim vê yekê jî bibêjim ku Salihê Qubîni jî heta ku tu bibêjî dengbêj e. Reso kilama Quling li Îspaya ku gundekî Bulanixê ye gotiye û şahidê wî hene ku quling bi ser serê wî hatine û çûne.





Ezbenî kilamên ku te bi xwe çêkirine çend heb in û kîjan in?

Kilama “Şêx Seîd Efendî” min çêkiriye. Min ev bûyer ji meleyekî bi navê Mele Evdil-rehmanê Palî yê Cizîrî hîn kir û kir kilam. Wekî din min kilama “Tayê Taloriyê” gotiye. Min li ser mala Seydo gotiye. Mala Seydo Seyîd in. Ew Seyîdên Mûşê ne. Wan li dijî Roma Reş serî hildabû.

Min 20-25 kilam çêkirine. Lê heta ku rûh di can û cesedê min de hebe ez dikarim kilaman bibêjim û kilamên ku ez dizanim xelas nabin.

Tu dengbêj î, çi navî li hunera xwe dikî?

Ez dengbêj im! Ez dengbêjê dîwanên giran im. Çawa ku di pirtûkxaneyekê de li ser her mijarê pirtûk hene, li ba me dengbêjan jî kilam û stran hene.

Dibêjin ku dengbêj derwêş in. Gelo ev yek rast e?

Salihcan, ez li seranserê welatê me gav bi gav geriyame. Ya rastî cihê ku kurmanc lê hebin, ez lê geriyame. Heke ev derwêşî, belê dengbêj derwêş in.

Li kîjan herêmê elaqeyeke mezin nîşanî kilam û dengbêjan didin? Ez dikarim bibêjim li her cihê ku ez çûme, elaqeya zêde nîşanî min dane lê herî zêde li Diyarbekirê. Paşê jî li Batmanê, Sêrtê, Mêrdînê û hema

bêje li piraniya Serhedê zêde elaqe nîşanî min didin.

Li ser dengbêjiya kevn û ya îro tu çi dibêjî?

Jixwe îro dengbêj nemane. Heyf û mix-abina giran, dengbêjiya berê jî nemaye! Mesela berê digotin; “Îşev Zahirê Dengbêj hatiye mala filankes!” Wê millet li wê malê kom bibûya. Wê çaxê teketûk teyîb hebûn, tiştê din tunebûn. Wê dengbêj heta serê sibê yan heta nîvê şevê kilam bigota, wê herkesî guhdariya wî bikira, kêfa xwe bikira û lê bixista biçûya mala xwe.

Mamê Zahir bi salan e tu li bajarê Aydînê dimînî. Ji bilî dengbêjiyê kar û xebateke te heye gelo? Tu dabara malbata xwe çawa dikî?


Kar û xebata min tune ye. Xebata min tenê li ser dengbêjiyê ye. Dengbêjî jî nemaye. Hama Xwedê îdare lo...!

Carinan derûdor gazî te dikin û dibêjin were kilaman bibêje?

Erê hin caran gazî min dikin. Piştî ku mirov yek du kilaman dibêje ev nîfşê nû tê û dibêje: “Heval zor spas ji bo we. Saz û amûrên me hene wê hunermendên me bistirên. Biborin.”

Zor spas ezbenî, mala te hezar caran ava be!

Avatir Salihê birazî, tu li ser herdu çavê min hatî...





ASTROLOJÎYA KURDAN

Zewijîyayîş yan Nêzewijîyayîş



Şadê AGON
sadeagonn@gmail.com

Erd û asmên zaneno ke qedere kurdan pê layêkê sîyayî ameyo bestîş. Kurdê rebenî emrê xo de rojêk pê çiyêk şa nêbiyê. Homayê rojhilat û rojawayî ne parçeyêk erd û ne zî qefleyêk varan kerdo nasibê kurdan. La hêviya xo kê mekerîn.

Seba ke qeder û cuya kurdan resm bik-erî; embaza ma M.D. rew ra ewnîyena falê kurdan. La ma rîca û dexalet kenê ke şima aye sey falbazêk mehesibnê. Çike M.D. ne pê peran nê karî kena ne zî wazena xo bido wasîfnayîş. A tena wazena ke çi dî çi mu-saye bimojna şima. Ez Şadê Agon nuştoxa nê nuşteyî ya nika qalem û klavyeyê xo dana destê M.D. Bimanê weşîye de wendoxê delalî.

“Ma bi xêr dî. Seke şima zî zanenê nameyê mi M.D. ya. Mi nêwaşt nameyê xo

eşkera bika coka mi nuştoxe ra zî destûr girewt ke şima mi tena pê herfan nas bikê. Bîyo di hîrê serrî ke ez ewnîyena der û dor, nat û wet û vizêr û ewroyê kurdan ra. Eşkera vaja ke ez xo serkewte hesibnena. Sirê mi no yo ke têkiliya mi û merdimê ke yenê cayê mi zaf baş o. Yanî mesele o yo ke ganî merdim ê bînan de pê biko. Mi nê serran de zaf çiyî musayî. Heta ma vajîme yew sîyasetdaro pîl yê kurdan zî qasê mi şarê ma mi ra holêr nêşinasneno. Ez bira û wayanê xo rê vaja şarê ma yo ke yenê cayê mi tewr zaf meraqê zewajî kenê. Hela ewil ez pê ney şaş menda Homa wekîl! La senî şaş nêba nê merdimî pêro ke mîyanê înan de mamostayî, hûnermendî, dewlemendî û xora wendekarê feqîrî zî estê ke -ê zaf muhîm niyê- serranê xo de pîl ê û debarê xo hol o. Mi reya ewil xo bi xo va yeqîna nê pê

mi yarî kenê. La barcî pê hesîya ke raşt a zî derd û kûlê înan zewaj o. Ez ke merdimêka wendaye yan zî zanaye nîya. La mevajîn ez hera hewt dewan a zî. Xebera mi sîyaset û rojaneyê dinya ra esta. Seke şima zî zanenê mîyanê kurdan de yew qîseyê femînîzm, pro-femînîzm, bîreyselleşme û nizam çî çî bîyo sey nîşana merdimbîyayîşî. Yanî nê çiyî pêro hetê mi de yenê maneyêk yan zî fermanêk; mezewijîn. Mi sey îmanê xo zanayêne ke şarê ma yo zanaye tim şinê semîneranê nuştoxanê ke înan ra teber yew qulê homayî kitabê înan nêwendê, feyz genê fotografanê xo vejenê aye yê ke cinî yê eteganê etnîkan kenê xo pay yê ke camêrd ê fularanê moran bestenê xo ra ke seke pro-femînîst berê hesibnayîş. La şima nêvatêne ke binê nê etegan û fularan de yew camêrdo ke wazeno cinîya xo wa nêxebite keyeyî de hîşarê gedeyan bibe yew cinîye ke wazena serranê xo ya vîst û heştanî ra ver qayîla ke bizewija esta. Ez zî guranê xo zanena, key ez nê çîyan hesîyaya mi ca qîseyê xo yê ke mi heta nika kanalanê kurdan ra museya bedilnayî. Nika kam bêro cayê mi ez her çî ra ver sey temînatêk ci rê vana ke ez zanena ti qayîl ê bizewijîyî la ti şermayenî ke herkes

nê çî bizano. Meraq meke qalê mi to qalî mîyanî.

Fertarî ez înan ra hêrs zî bena. Ê heyran coka ti wazenî bizewijî wa kam çî vano wa vajo. Bî di serrî ke nê hedîseyî pêro bîyî. Hînî nêeşkena biewna falê şarê ma ra. Yew birazeya min a vîya esta. To ra dûrî bo sey to genc a. Nika ez ha dersanê falî dana aye. Mesela şeklê maseyî yan zî şeklê koyî yeno çî mane mûsnena ci. Xora musayîşê maneyê şeklan zor nîyo, her zî eşkeno bimuso. Karo o zor zî rast a o yo ke ganî merdim derd û royê şarê xo fular û eteganî ra ney awiranê înan ra fam biko! Axir ez nêeşkeya safî bika beno ke birazeya mi pê bieşka. Homa pîl o.”





Êvar bihuşt e carna, elmast e li gerdeniyê
Nexşê kalaneke kufarî,
Carna xewneke lerizî ye mîna baskên perîdankekê
Leza lûs e carna,
Carna kelecana evîneke nû ye; kawik û bizdonek
Carna jî kesera rabirdûyê...
dûyê cixareyekê, yan jî tenêtî, bêxwedîtî,
De çi be...
ew kêlî, ew hingur mîrata min e.

Quba Medreseya Zînciriyê / Mêrdîn

TEHSÎN BARAVÎ
tehsinbaravi@gmail.com



BINGEHÊN ROJNEMAGERIYÊ ROJNAMEGERIYA Û KURDAN



Murat Bayram

Zimanê medyayê!

Bêguman geşbûn an jî çilmisîna medyaya kurdî jî wek ziman, edebiyat û zanista kurdan bi rewşa wan a giştî û desthilata wan ve girêdayî ye. Bi hebûna dinyaya dijîtal, kurd dikarin hin derfetan bi kar bînin, ji xwe heta astekê bi kar tînin. Em ê li vê derê bi kêmayî û zêdeyîyan behsa hin tespîtên li ser medyaya kurdî ya latîni bikin.

Bêyî zimanekê serast û pîvanên bingehîn ê zimanê kurdî yên wek tewang, ergatîf ...hwd ti nivîsên kurdî nikare bê nivîsîn. (Edebîyat û hûner wê rêyê dide nivîskarên xwe ku bi zimanî bilîzin û rêyên xweser ji xwe re çêbikin ev yek li derveyî vê pîvanê ye.)

Kêm kes hene ku dizanin bi zimanê kurdî binivîsin. Têra medyaya kurdî rojnamegerên kurdînivîs nînin. Ew kêmasî kesên heyîn difikirin ku qasî başiya zimanê xwe

dikarin rojnamegerên baş jî bin. Ji xwe minaqeşeyên li ser medyaya kurdî jî ji gava yekem naborin. Ew jî “zimanê medyayê” ye.

Rêzimana kurdî û zimanê medyayê

Gelekê xerîb e ku minaqeşeyên li ser zimanê medyaya kurdî, minaqeşeyên li ser rêzimana kurdîyê ne.

Zelal e ku her kesên kurdînivîs mecbûrên rêzimanê ne(standardeka giştî heye bi tenê li ser hûrgilîyan minaqeşe hene). Lê rêziman karekî ji beriya rojnamegeriyê ye. Ji beriya kesek dest bi nivîsînê bike ji xwe divê rêzimanê bizane û rê nede rêziman zimanê medyayê dagir bike.

Desthilata siyasetmedar û zimannasan

Gelek kes hene, wek min hemîya roja xwe ya karî bi nivîsîn, wergerandin, berhevkirin, serastkirin ...hwd ya nûçeyan derbas dikin.

Bêguman desthilata zimanê medyaya kurdî karê edîtor û nûçegihanên medyaya kurdî ye. Divê em rojnamegerên kurd ji qonaxa yekem a rêzimana bingehîn biqetîn û dest bi minaqeşeyên li ser zimanê medyaya kurdî bikin.

Ji bo parastina pîvanên medyayê, heta ku ji bo pîvanên mirovatiyê divê qasî ku em li dijî siyasetmedar û siyasetên dijber in em li hemberê siyaseta xwe û siyasetmedarên xwe jî bisekinin.

Mafê agehdarbûnê mafê hemî xwendevan, guhdar û bînerên medyaya kurdî ne. Ji bo nimûne heke em nêzîkî partiyeka radîkal a kurdan bin, em nikarin ji bîr bikin ku mafê guhdar, bîner, xwendevanên me heye bi zimanê xwe bizane ka serokê partiya nijadperest a tirkan çî dibêje(bêyî reşkirin û bikarhînan zimanekê req.)

Ku-ku-ku

Avakerê Ajansa Nûçeyan ya Reutersê Thompson Reutersî diyar kiriye ku “dema tu bikarî bûyerekê bi du gotinan bibêjî bi sê gotinan nebêje.(Reuters.com)”

Nûçegihanên latînînivîs, di naverokê de tiştên bi sê gotinan dikare bê gotin bi deh gotinan dibêjin. Bi gihaneka “ku”yê gelek agahiyan li heman komekê zêde dikin. Li sernivîsan jî tiştên divê bi sê gotinan bê gotin bi du gotinan dinivîsin.

Çend Xeletiyên Kronîk ên Medyaya Kurdî

Rûdaw(23.07.2018, Nûçeya li manşetê)

- Li dijî avahiya Parêzgariya Hewlêrê êriş çekdarî!

Ya Rast:

Li dijî avahiya Parêzgariya Hewlêrê êriş çekdarî hatiye kirin!

Ya rasttir:

Du êrişkarên êrişî Parêzgariya Hewlêrê kiriye

<http://www.rudaw.net/kurmanci/kurdistan/23072018>



Ajansa Anadolûyê(23.07.2018, Nûçeya li manşetê)

Li Hewlêrê li dijî avahiya Walîtiyê êriş

Ya rast:

Li Hewlêrê li dijî avahiya Walîtiyê êriş hatiye kirin

Ya rasttir:

Li Hewlêrê, du êrişkarên êrişî walîtiyê kiriye

<https://www.aa.com.tr/kk/dinya/li-hewl%C3%AAr%C3%AA-li-dij%C3%AE-avahiya-wal%C3%AEtiy%C3%AA-%C3%AAr%C3%AEs/1211057>

Ajansa Mezopotamyayê(23.07.2018, Nûçeya li manşetê):

Nûçegîhana Ajansa Nûçeyan a Hawarê (ANHA) Dicle Ahmed, ku bi dehan êriş û operasyonên şer şopand û dîmen û wênayên wan kişand, şoreşa li Kobanê dest pê kir û li Rojava belav bû vegot. Dicle Ahmed, wiha got: “Min ji nîşaniyê xwe re got: Bila Kobanê azad bibe em piştê bi hev re biçin. Ger ku em ji welatnê xwe hez dikin, em azad bikin û piştê biçin. Lê bersîva neyînî da banga min. Li ser vê yekê min dest wi berda. Kobanê di wî halî de ez nikaribûm Kobane terk bikim û biçim.”



Ya rast:

Dicle Ahmed nûçegihaneka Ajansa Nûçeyan a Hawarê (ANHA) ye. Dema şoreşa Kobanîyê dest pê kirî û li rojavayê belav bûyî, bi dehan êriş û operasyon çêbûne. Wê dîmen û wêneyên şoreşê girtine.

Dicleyê ji Ajansa Mezopotamyayê re got:

“Min ji nîşaniyê xwe re got: Bila Kobanî azad bibe em pişt re bi hev re biçin. Ger ku em ji welatê xwe hez bikin, em azad bikin û pişt re biçin. Lê bersîva neyînî da banga min. Li ser vê yekê min dest ji wî berda. Kobanî di wî halî de ez nikaribûm Kobanîyê terk bikim û biçim.”

<https://mezopotamyaajansi.com/kr/JIN/content/view/29898>

Pirsek

(23.07.2018, Dengê Amerîkayê, Nûçeya li manşetê):

Îran li Dijî Gurkirina Girjiyan Huşdariyê Dide Amerîka.

Hûn ji vê sernivîsê çî fêm dikin? Gelo Îranê Amerîka hişyar kiriye(dema borî), Îran Amerîkayê hişyar dike(dema niho) an jî Îran ê Amerîkayê hişyar bike(dema bê)?

10 bingehên rojnamegeriyê

Mixabin di çavkaniyên tirkî û kurdî de, agahiyên bingehên ên rojnamegeriyê, bi awayekê rêkûpêk nînin. Min ji notên Zanîngeha Pennê ji bo Popkurdê 10 bingehên rojnamegeriyê yê giştî wergerandin. Her bingehek mijara dersekê ye lê li vê derê ew derfetê me nîne ku em berfirehtir binivîsin.

1. Piştrastkirina agahiyan.
2. Bêalîbûn.
3. Resenbûn/orjînalbûn.
4. Dayina temama agahîyan, nehiştina kêmahîyan.
5. Zelalbûn.
6. Adilbûn.
7. Sînordarkirin û kontrolkirina xwe.
8. Mirovparêzî.
9. Agahiyên ku dikare hesabê wê bê dayin, bê hesibandin.
10. Bihêzkirina aliyê zeîf/qels.

Murat Bayram

miradgundiki@gmail.com

Editorê bianet/kurdi ye. Ji bo Kurd1, Rojnameya Evro, Nefel, Waar TV û Kurdistan24ê wek qunciknivîs, nûçegihan û edîtorê nûçeyan xebitiye.

Wek rojnamegerê serbixwe ji bo Middle East Eye, Deutsche Welle, RT TV, Aljazeera Int. û New York Timesê kar kiriye.

Ji Zanîngeha Kalîforniyayê ya Los Angelesê xelata “nivîsîna herî afrînêr û orjînal(2012)” û ji Cemiyeta Rojnamegerên Başûrê Rojhilatî xelata “rojnamegerê salê(2014)” standiye.

Têbînî: Di nivîsê de ji “medyaya Kurdî” meqsed “medyaya Kurdî-Kurmancû-Latînî ye.”



BLOGA ÎNAN EROĞLU

inanolo.blogspot.com

Ji sala 2016an ve dibêje

“Jehr tê de be”

ME JI 10 KESAN PIRSÎ:



Bi te piştî sala 2000an albûma herî baş a muzîka kurdî kîjan e? Çima?



MIZGÎN ARSLAN ŞAYBAK

Dema ev pirs ji min hat pirsîn hema suretê Mirady li ber çavê min peyda bû. Bi taybetî albûma wî ya dawî ku min heta niha bi deh han caran guhdar kiriye. Belkî gelek stranbêjên kurd cûreyên edebiyatê adapt-eyî stranan kirine lê di vê albûma Mirady de wekî ku ev rihê edebiyatê bi awayekî xwezayî heye. Ji bo muzîka kurdî bigihêje asteke baştir divê stranbêj xwe ji zincîra folklorê piçekî azad bikin. Ferqa “Xwelî”yê ji bo min ev e, mirov him moderniteyê hîs dîke di stranan de him jî hêza folklorê.



RÊDÛR DÎCLE

Ji sala 2000an û vir ve gelek albumên xweşik derketin û xebatên hêja hatin kirin. Lê belê, ligel van album û xebatan, gelek tiştên dejenerebûyî ku xesarê didin û dan muzîk û çanda me jî hatin kirin. Di vê çarçoveyê de wexta meriv li xebatên muzîkî yên hatine kirin dinêre, li gorî min albûma ku bi awayekî cidî hatiye amadekirin û gelek tiştan di xwe de

dihebîne albûma “Azadî” ya Nizamettin Ariç e ku di sala 2011an de derketiye. Lew, muzîk awayê herî muhîm ê heqîqeta Kurdî ye û ev album bi muzîka xwe di vê çarçoveyê de xwedî kûrbûyîneke ruhî û dewlemendiyeke çandî ye. Li ser esasên muzîka gelêrî ya Kurdî xwedî taybetmendiyeke pirdengî, yanî contrapuntal e. Di navbera muzîka Kurdî ya gelêrî û ya cîhanî de pêwendiyeyeke xweşik daniye.



AYSER ÇINAR

Bi ya min albûma herî baş a van salên dawî “Sîyam”a Rojdayê ye. Li gorî min; Rojda yek ji stranbêjên herî jêhatî yên muzîka Kurdiyê lê mixabin zêde nayê nasandin. Muzîk di navbera rabirdû û dahatuyê de pirek e û Rojda bi vê albûmê, bi dengê xwe yê zelal me dibe rabirdûyê. Di vê albûmê de, êş, evîn û kêfa Kurdan hemû hene. Herwiha trajediya li Cizîrê, Nisêbînê û Sûrê jî di strana “Ez im ez im” de xwe dide der. Ji bo min bi qasî hunerê, sekna politik a hunermendan jî muhîm e. Rojda jiyana Kurdan wekî neynikê nîşanî me dide. Albûmên wê tim di refên min de ne.



MEVLÜT OĞUZ

pênaseyên ‘herî’ û ‘ewil’
her tim bi problem in,
lewma heta ji min tê ji wan
dûr diçim lê bi dilekî rihet

dikarim bibêjim ku albûma Nizamettin Arîç a bi navê “azadî” (kalan muzik, 2011) yek ji albûmên herî baş ên van salên dawiyê ye. Ji ber ku Azadî, mînakeke baş a helbestên bestekirî ye.

wekî ku tê zanîn di albûma Azadiyê de şîrên du helbestkarên gewre yê edebiyata Sovyetê Fêrîkê Ûsiv û Eskerê Boyik hatine bestekirin. Şîrên Ûsiv/Boyik û muzîka çak a Arîçî xweş li hev baniyane û xweş li hev hatine; di navbeyna gotin û newayan de hevsengiyeke spehî heye.



DERYA KILIÇ

Di demen dawî de gelek
albûm û kom hene ku
dema ez wan guhdar dikim,
dûrbûn û bindestiyê ji
bîr dikim. Yek ji wan deng û
koman ji Rojhilatê Kurdistanê ye;

Albuma ‘Khorshid e Mastan’ a koma Kamkarsê ku di sala 2012an de derketiye. Ev album dilê mirov dibe Rojhilatê û çîrokên Rojhilatê distrîne.

Yan din ji Bakurê Kurdistanê ye ku ev jî albûma koma Lawje ‘Selîqê’ ye û di sala 2013an de hatiye derxistin. Ev albûm jî hem ji bo mûzîka Kurdî û hem jî ji bo folklorê Kurdî gelekî xweş û hêja ye. Her wiha tenê stranê nabêjin. Di her stranê de çîroka Mezopotamyayê vedibêjin. Lê bi ya min Lawje ji bilî çêkirina hunerê kelepориya zimanê Kurdî û Kurdan jî didomîne û dide nasîn. Ez hêvî dikim em ê di sibêrojê de berhemên hêjatir bibinin.



SELAMÎ EESAN

Helbet ne “Veger”a
Ciwan Haco ye! Piştî
mîlenyûmê dînamîkên
civaka Kurdî guherîn û
vê yekê bivênevê tesîrê li

muzîka Kurdî jî kir. Mesele ew e ku huner bikaribe ruhê nemiriyê zebt bike û bi tarzeke resen berê wê bide sehneyê. Civakên azad he’j nûbûn û nûkirinê dikin, çinku, li gorî wan “jîyan” berdewam e. Muzîka Kurdî jî mecbûrê vê felsefeyê ye. bi “mirin”, “kuştin” û “dûbare”yê hew dê xwe bixwe. Bo nimûne, tê gotin ku di salên 90’î de nêzingî 400.000’an kasêtên Şehrîbana Kurdî dihatin firotin. Lê, ka Şehrîbana Kurdî?

Kurt û kurmancî bersivê bidim: “Zeng”a Sîya Şevê! Bi ya min “Zeng”, di esasê xwe îtirazek e li hemberî muzîka Kurdî ya zeng-girtî; hilmekê nû ye di muzîka Kurdî ya fetisî de. Helbet, Sîya Şevê hew behsa “Zeng”ê nekir, behsa “Pûç”bûnê jî kir. Lê çi bû? Pîyase,

komîserên hunerê û muzîka kirêt ji wan re gotin “Hûn ‘Bêyom’ in!” Çi kirin û nekirin Sîya

Şevê ji resenîya xwe nehat xwarê û got “Em ‘Li Pey Sîya Xwe’ ne!”



ADEM ÖZGÜR

Albûma Ax lê Wesê.

Rewşan Çelîker, huner-mendeka nû tê qebûlkin. Stranên Rewşanxanê yê di medyaya cîvakî de tîn weşandin, pir tîn ecibandin û parvekirin. Albûma Rewşan Çelîkerê ya bi navê “Ax lê wesê” li sibatê derketibû. Di vê albûme de 5 stranên kurdî, 3 jî stranên Ermenkî hebûn.

Stranên albûmê de gelekî xweş in û Rewşanxanê konsepteka nû anî muzîka kurdî. Ez dikarim bibêjim ev albûma di salên dawî de albûma her serkeftî ye.



JIYAN TUNC

Albûma Yunus Dişkaya ya bi navê Kamiran. Ji ber ku di vê albûme de heke hûn bala xwe bidin gotinan gotin, heke hûn bala xwe bidin muzik û melodiyê,

harmoniyeke muzîkê heye ku hûn jê têr nabin. Di strana bi navê 'Gulê' de kêfeke melankolik heye lê naêşîne. Dibêje "muzîk tiştta ku em dibihîzin e."

Gotinên wî yên tîjî nîgaş hene û helbestvaniya wî her Koçero tîne bîra min. Neke-tiye nav qaliban, tarzeke ku nikarim navekî lê bikim ava kiriye. Helbestên Cegerxwîn û Kamiran Bedirxan bi dengê wî careke hatin dinyayê.



İBRAHİM XELİL BARAN

Piştî 90î mûzîka Kurda hate polîtîzekirin û bi serdestiya partiyên xetîmîndana mûzîka me jî destpêkir. Lê jiber ku hinek

albûmên berî 90î li Ewropa derketin di dawiya salên 90î û di despêka salên 2000î da ketine dest me, em dereng bi vê xetîmandinê hisiyân.

Mesela berhemên Ciwan Haco yên bi navê Girtiyên Azadiyê (1987) û Sî û Sê Gule (1991); ya Nîzamettîn Arîç a bi navê Wêneyên Xewnan (1993); albûma Azadî ya Koma Wetanê (1979) û albûma Nûbûn (vokal

Nûrê, 1996) encax di sala 2002-2003êyan da hatin derxistin û li Bakurê Kurdistanê hatin guhdarkirin.. Ji ber vê wekî her tiştî, teqwîma Kurdan a dîskografiyê jî çello melo, xwar û xurde ye.

Lê bi min piştî 2000an albûma herî baş Dej (2016) a Kerem Sevinç e. Çima? Kurdîesk e, Zazakî ye, modern û western e, ruhdar û kûr e, gotinên stranên hemû helbest in ne tirro virro ne, besteyên wan bêhempa û orjînal û eslî ne, arenjeyên wan ecêb in, xwedî ihtîşam in. Loma, lewma, wilo.

Di wê albûmê da Rayir, Poşman, Eşkera, Êsîr û Mîssal stranên giranbuha ne û ne bawerim heta çendekî stranên wiha werin gotin... Aferîn Kerem Sevinç, aferîn.



ROJBÎN ÖZKAN

Bi rastî nikarim bejim; .aya ji hemû albumên sala 2000 vir de heye. Lê qasê ku jê haydarim dikarim bêjim, li gorî min, albuma birêz Adem

Tepe "dûrketim" albûma herî xweş e.

Ji ber ku birêz Tepe starên klasik û ên nûjen bi hev re bi dengê gelekî xweş distirê.

taybet stranên herema serhedê her vеха stranên dengbêjiyê jî.

pîrozbahîyê li kovara Popkurd dikim. hêviyamin ew e ku temen dirêj û sûdwer be... Silav û rêz..

Werin em
POPKURDÊ
bi hev re
mezintir bikin.

ÇEND AGAHÎ LI SER SÎNEMAYA KURDAN



SALIH SULEYMANÎ
salihisuleymani@gmail.com

HEVNASÎNA KURD Û SÎNEMAYÊ

Yekem filma ku qala kurdan dike Zerê ye. Bi destê derhênerê ermen Hemo

Beknazaryan sala 1926an li Ermenîstanê li gundekî kurdên Elegezê reş û spî û bédeng hatiye kişandin. Beknazaryan heman demê avakarê sînemaya ermenan e jî. Çiroka filmê ji aliyê Hakob Gazaryan hatiye nivîsîn. Vi kesî bi tîpên ermenkî alfabe ya kurdî jî amade kiriye. Di filmê de Zarê û Seydoyê şivan dilketiyê hev in. Lê belê axayê gund Têmûr Beg çav berî Zarê dide û keşmekeşî

wisa dest pê dike. Sala 1970, bestekarê ermen Aleksandir Spendiarov bi muzîka xwe deng dide filmê. Film him bi çiroka xwe him jî terza xwe ve hêja ye û destpêka sînemageriya kurdan e. Sala 2006an jî li Festîvala Fîlmên Kurd a Londonê bi arpa muzîsyena mezin Tara Caf hate nişandan.


TIRKIYE Û EVDO AXA

Li Tirkîyê jî yekem car kurd û sînema sala 1951ê rastî hev tîn. Derhênerê eslê xwe kurdê Xarpêtê Atif Yilmaz, di filma xwe Mezarımı Taştan Oyun de yekem car kurd, her çiqaş kurdî nebe jî, dibin mijara sînemayê. Senarîstê filmê Huseyn Peyda ku ew jî eslê xwe kurdê Riha ye, bi rola Evdo Axa ve reng û rûçikê kurdan gelekî qenc anî devê kamerayê. Jixwe mirov baş lê binêre, hiç cudahiya Evdo Axa û Têmûr Beg tune ye. Çirok ji straneke kurdî a herêma Rihayê hatiye tomarkirin. Atif Yilmaz piştê gelek filmên xwe li ser jiyana kurdan çêkirin. Keynî wî gelek dest pê kir. Ekserê wan jî li ser axa û began bûn. Zulfo Axa, Maho Axa û hwd.

EFSENEYA YILMAZ GUNAY

Her çiqaş despêka sînemaya kurd zûtir be jî, ji 1926an heta dawîya sedsalê di sînemayê de kurd tune ne. Piştî sala 2000ê, gelek derhêner û filmên kurd derketin. Him jî bi kurdî. Lê belê di vê navberê de Yilmaz





Güney heye ku tena serê xwe şoreş kiriye. Hema bêje hemû filmên wî salên dawî li ser kurdan in. Fîlma wî bi navê Yol (Rê) sala 1982an li Festîvala Cannes'ê xelata palma zêrîn wergirt. Güney sala 1984an li Fransa bi pençeşêrê koça xwe dawî kir. Salên 90î bo sînemaya kurdan çend gav hatin avêtin lêbelê zêde deng venedan. Wek mînak; filmên Mem û Zîn (Ümit Elçi-1991), Siyabend û Xecê (Şahin Gök-1991) Rêwîtiya Bê Deng (Brahîm Selman - 1994), Işıklar Sönmesin (Reis Çelik - 1995), Güneşe Yolculuk (Yeşim Ustaoglu - 1999), Sınır (Gani Rüzgar Şavata - 1999) hatin çêkirin.

MÎLENYUMA KURDAN

Xelasbûna sedsalê gelek tiştên baş bi xwe re anîn. Ne tenê tiştên siyasî, gelek bûyerên hunerî jî di nav civaka kurd de pêk hatin. Gelek derhênerên kurd gihîştin, filmên xwedî xelat çêkirin û navê sînemaya kurd bilind kirin. Behmen Qubadî, Hiner

Selîm, Cano Rojbeyanî, Xelîl Çiya, Şewket Emîn Korkî, Nuray Şahîn, Cemîl Rustemî, Huseyn Karabey, Hîşam Zeman, Kazim Oz, Miraz Bêzar, Ozgur Dogan, Taha Kerîmî, Mihemed Deracî, Celal Canroyî, Tayfur Aydın, Şiyar Abdî, Umur Hozatli, Orhan Eskikoy, Karzan Kader, Omer Levendoglu, Elî Kemal Çinar, Ferît Karahan, Erol Mîntaş, Şîrîn Cîhanî, Aydın Orak, Matîn Qubadî, Helkewt Mistefa, Bulent Gunduz, Husên Hesen, Omer Sehîm Xelife, Mihemed Elî Konar û gelekên din van salên dawî li ser navê sînemaya kurd berhem dan.

NAVNAS, KURDISTAN

Bona mirovekî nasname, bona devletekî al çî be, bona filmekê jî navnas (kunye) ew e. Piştî evqas berxwedan û têkoşîna netewî kurd bûn xwedî statû. Sala 2001ê yekem car derhênerê başûrî Cano Rojbeyanî di navnasa filma xwe Jiyan de Kurdistan nivîsî. Piştî vê yekê bi piştgiriya başûr, gelek filmên menşe Kurdistan hatin kişandin. Wê pê ve, li platformên fermî û navnetewî ev kunye jî heye. Kîlometro Zeroya Hiner Selîm sala 2005an bi navnasa Kurdistan li Cannes'ê hat qebûlkirin. Cemîl Rustemî jî bi filma xwe Şîna Berfê ve beşdarî Xelatên Oscarê beşa filmên biyanî bû.

ZAZAKÎ SÎNEMA

Sala 2004an Nuray Şahîn yekem dirêj metraj filmeke bi zaravayê zazakî kişand û li Ewropa da nîşandan. Fîlma derhênera hêja bi navê Perre Dima So beşdarî hin



festîvalan jî bû û xelat jî qezenckirin. Tevî ku kurdên zaza gelekî bi hunerê re eleqedar in, mîsal muzîka zazakî gelekî serkeftî ye, di sînemayê de ev zarava kêr hatiye karanîn. Hiner Selîm filmê My Sweet Pepper Land zazakî tevde bi sê zaravayan kişand. Sala par jî Mihemed Elî Konar filma xwe Hewno Bêreng temamî bi zazakî kişand.

KURT METRAJ

Bo derhêneran pêngava sereke bo xwe îsbatkirinê çêkirina kurtefilmên e. Her derhêner wisa xwe diceribîne û xwe dipîve. Ez dixwazim navê 4 derhênerên genc ku kurtefilm çêkirine bidim we. Bawerim ev çar kesan dê rojên pêş me gelek filmên hêja bikêşin. Bi kurtefilmên xwe ve huner û sînemageriya xwe piştrast kirine. Arîn Înan Arslan, Orhan İnce, Babek Amînî û Serhat Karaarslan.

FESTÎVALÊN LI DERWELÊT

Her karûbarê kurdan li ser sînemayê li derveyî Kurdistanê pêk tê. Mîsal yekem animasyona kurdî bi navê Efsaneya Kawa li Îngilistanê hat amadekirin. Yekem film li Ermenîstanê, yekem temsîliyet li Germanya, yekem xelat ji Ewropa filan û bêvan.

Yekem festîval jî li Londonê hat lidarxistin û berhemên ji Kurdistanê hatin nîşandan. Him deng veda him jî rêkûpêk tê kirin. Her çiqas li başûr û bakur gelek festîval hatin destpêkirin jî esas li ser navê kurdan mîhrîcanên baş li derveyê welêt çêdibin. Festîvala Fîlmên Kurd a Berlînê û Amerîkayê jî her sal tên kirin.

AGAHIYEK MAGAZÎNEL

Hema bêje hemû kurdên kurdîzan Evdila Keskîn dinasin. Li ser hesabên medyayê bi hezaran şopîner û heyranên wî hene. Nizanim çend ji wan kesan dizanin ku vî camêrî filmeke sînemayê de jî rolekî girîng listiye. Di filma Hiner Selîm bi navê Dol (2007) de karakterê Çeto dilize. Çeto li pey şopa cesedê xweşka xwe ye. Xweşka Çeto di goreke komî de hatiye veşartin. Bi min, gorî listikvanên salane gelekî qenc listiye. Mîna şervanekî ku li qada şer bireve her sengerê, kek Evdila jî warê kurdî her karê hêja kiriye. Fenanî xizmeta çand û ferhengê, xizmeta çapxane û paşxaneyê, karê sosyal medya û kurdînişiyê, listikvanî jî li wî hatiye. Bi vê mebestê hemû silavên xwe yên sînemahez bo rewşenbîr û hêjayê kurdan Evdila Keskîn dişînim. Qedrê wî ba me zêde ye.



Kovara Psychology Kurdî

Psychology Kurdî yekem kovara derûnnasiyê ya bi Kurdî ye û ji çar mehan carekê derdikeve.

Edîtoriya kovarê Abdulsittar Özmen, Mehmet Ali Erol, Siyabend Aslan û Kenan Örmek, redaksiyona wê jî Leyla Nisêbînî û Kenan Örmek dikin. Kovar jî weşanxaneya J&Jyê derdikeve.

Edîtorên kovarê dibêjin em dixwazin ev kovar jî derûnnasiya kurdî re bibe stûnek û bikaribin “psychology”ê bi Kurdî bi kar binin û di vî warî de dewlemendiya Kurdî nîşan bidin. Herwiha diyar dikin ku armanceke wan a din jî ew e ku bi zimanê bavûkalan fêrî derûniya xwe bibin û di vî warî de arşivekê ava bikin.

Heta niha şeş hejmar derketine û her hejmarek li ser mijareke sereke rawestiyaye ligel babetên din ên derbarê derûnnasiyê de. Hejmarên ku derketine li ser van mijaran sekinîne:

1. Zarok, Şer û Trawma
2. Derûndermaniya Trawmayê
3. Şîn û Şûn
4. Ziman û Derûniya Perwerdehiyê
5. Derûnnasiya Civakî
6. Made û Bengîtiya Madeyan

Kovara Derûnnasiyê

Psychology Kurdî

2018 | Gulan • Hezîran • Tîrmeh • Tebax
Hejmar: 6 Sal: 2 Bihê: 10ê

MADE Û BENGÎTIYA MADEYAN

- » Hevpeyvîn bi Prof. Dr. Kültegin ÖGEL re
- » NSPT û Bengîtiya Dermanên Eşbir
- » Hevpeyvîn bi Derûnnas Dr. Raquel Barros re
- » Azmûna Derûnnasiyê li gel Meseleya Kurdan



Kovarê heta niha bi kesên ku di warê derûnnasiyê de pispor in û deng vedane yên weke Prof. Dr. Jan İlhan Kizilhan, Prof. Dr. Philip Zimbardo, Prof. Dr. Vamik Volkan, Prof. Dr. Cem Kaptanoğlu, Prof. Dr. Melek Göregenli, Zimannas û Lêkoler Deham Ebdulfettah û Doç. Alk. Murat Paker, Prof. Dr. Kültegin Ögel, Derûnnas Dr. Raquell Barros re jî hevpeyvîn kiriye.

Daxwaza edîtorên kovarê ew e ku çî kesên li welat û li derveyî welat ên pisporên derûnnasiyê, ji wan re binivîsin û bibin alîkar.


Ez Diçim Mosko*



Gulsuma Demir | lavlavkaspi@gmail.com

Di rêwitiya we de hema bêjin tişta herî muhîm çaxê çûyîna we ya Moskovayê ye. Li gorî wê divê hûn çente û menteyên xwe amade bikin, herin ji Decathlonê hin derpiyên termal bistînin. Heke hûn di navbera mehên Mijdar û Nisanê de herin halê we ne ti hal e. Mosko wan çaxan gelekî sar e. Bi teybetî meha Çile û Sibatê. Heke hûn piştî Nisanê herin, Mosko gelekî xweş e. Her der şîn, kulîlk, dar... Lê mixabin ev xweşikî gelekî berdewam nake û paşê havînekê tê, havînekê germ û têra xwe kin. Hema bêje du meh nado. Li gorî wê haziriya xwe qenc bikin.

We çenteyê xwe amade kir, bilêta xwe kirrî û hûn ji bo rêwitiya xwe hazir in. Dibe ku beriya çûyîna Moskovayê, hin hevalên we ji we re bêjin 'li wir, li Moskovayê fêkî û zebzeb gelekî buha ne.' Ji wan bawer bikin. Piştî çûyîna xwe ya Mosko hûn ê Meseleya Bacanan ji gelekî baş fêm bikin.



Hûn li balafirgehê, nizam li ber deriyê çendemîn disekin. Li dora xwe dimeyzênin, tev zerik in, Rûs in, dibe ku hin kesên Turkmen, Kazak, Tatar filan ji li ber çavên we bikevin. Rêwitiya we ya ji Stenbolê heta Mosko nêzî du saet û nîvan an ji sê saet û deh deqqeyan filan wê dewam bike, ev molet li gorî şirketan diguhere.

Piştî sê saetan hûn li Mosko ne, **Добро пожаловать в Россию.**¹ Ji teyarê peya bûn û bi şopandina Rûsan hûn xwe li ber cihê qontrola pasaportan dibînin. Li kabîneyan dimeyzênin me'murekê/i rûken nîn e, hemû sar in, nakenin. Tu dibê qey hûn ji kîsê bavê wan dixwin. Welcome to the North! Hûn dibêjin ya bi xêr û dikevin dorê. Piştî çend deqqeyan hûn xwe li ber me'murekê/i dibînin. We pasaporta xwe da û hûn ji ya/ê hember re dikenin,

* Ez diçim Mosko navê helbesteke Qedrî Can e ku di sala 1911 an de li Mêrdînê hatiye dinyayê û di sala 1972 de Lî Şamê çûye rehma xwedê.

1 - Hûn bi xêr hatin Rusyayê - wek dabro pajalavat b Rasiyu tê telafûz kirin -



lê bersiv nîn e. Aciz nebin, bêhna fireh. Pasaporta we di destê wê/î de geh li we dinêre geh li pasaportê, netirsin her tim wilo ne. Ger hûn ji bo xwendinê hatibin vî welatî wê kaxezekî bidin we - dibe ku bidin turîstan jî lê nizanîm - - immigration card - divê hûn îmze bikin. Û paşê wê bibêjin **вот и все**², îca hûn dikarin vêga herin û çenteyê xwe bistînin. Beriya çûyînê li wî/ê meyzênin û bêjin **Большое спасибо**³. Belkî piştî vê spasa we bikene! - ona kûçûk sûrprizler yapın! - We çenteyê xwe stend, qontrolêke dawî û êdî hûn dikarin bi dilekî rehet bêjin ez li Moskovayê me. Hema bêjin ji hemû balafirgehan trêna diçin navenda bajêr û hûn dikarin ji navendê bi xêra metroyan herin hemû deran. Heqê trêne 500 Ruble ye. Netirsîn, bala xwe nedin van sifiran, 500 Ruble yanî 36 TL. Li gorî Stenbolê dîsa buha ye lê ma çî bikin, jixwe Moskova piçekî jî bi buhabûna xwe navdar e.

Hûn hatin navenda Moskovayê û hûn ê biçin cihê ku hûn ê lê bimînin. Li navenda bajêr her tim bi navê **Moscow_FREE_WIFI** torek heye ku hûn dikarin têkevin înternetê û di metroyan de jî tora bi navê **MT_FREE** heye. Ji bo siwarbûna metroyan jî lazim e çertê bi navê **тройка**⁴ bê peydekirin. - hûn dikarin bilêtên ji bo careke an jî du caran jî bikirrin. Ew jî ji bo careke 50 Ruble ye yanî 3.63 TL - Peydekirina wan çertên bi navê **тройка** jî li hemû rawestgehan mumkun e. Ji bo ku hûn bikaribin bîst caran bi kar binî divê hûn 746 Ruble yanî 55 TL bidin. Hûn dikarin çertê xwe bikin mehane jî; ew jî 2050 Ruble ye, yanî dora 150 TL.


2 - Evqas e, xelas - wek vot î fiso tê telafûz kirin-
3 - Gelek spas, mala we hezar caran ava - wek balşoy spasîba tê telafûz kirin -
4 - Troika

Li metroyên Moskovayê jî 160î zêdetir rawestgeh hene û di rojekî de jî nêzî 9 milyon kes pê diçe û tê. Ev agahî tê wateyê ku ev hêjmar ji hejmara tevahiya rêwiyên metroya London û New Yorkê zêdetir e lê bila çavê we netirse ji ber ku metroyên Mosko diçin hemû taxan hûn wê qelebalixiyê çet hîs nakin. Hûn di saetên herî tije de jî rêwîtiye bikin aciz nabin û dîsa qasê Mar-maraya Stenbolê nakevin nav hev, bêhna xwidana tu kesî nayê ber pozê we.

Li Mosko rawestgeha metroyê ya bi navê **Комсомольская** - 2017

Heke rengê we wek rengê Rûsan ne gewrik be hûn ê di metroyê de demekî bîn çavderîkirin. Ger hûn bi hin kesan re dest bi civatekê bikin û hûn piçekî reşik bin wê bêjin; 'Ma tu Ermenî yî?'. Heqê wan heye vê pirsê bikin, sedema yekem ev e ku rengê me bi rastî jî dişibe hev û sedema din jî li Rûsyayê nêzî 2 milyon û niv Ermenî hene. Lê ger hûn bejin ez Kurd im, fêma nakin. Û ger hûn navê welatê xwe, navê Kurdistanê bêjin wê wek Qirgizistanê fêma bikin. Yanî di dawiyê de hûn mecbur dimînin bêjin ez ji Tirkîyê me. Û jixwe dema ku we got Tirkîyê, wê bibêjin tu Tirk î û wê ji we re behsa rêze-filmên Tirkan bikin. Li Rûsyayê jî rewşa rêze-filman jî yên Tirkîyê ne cûda ye. Senaryo diyar e, keçikeke feqîr û lawikekî dewlemend. "Yaw" dibêjim bi awayeke ecêbmayî, "ji vî welatî Dostoyevskî, Tolstoy, Bulgakov, Gonçarov, Gogol, Puşkîn, Tolstoy, Gogol, Nobokov derketiye. Eyb e, şerm e, guneh e." - kanî afirînerî kanî!!

Bi çûyîna we ya Mosko re belkî fêkî û zebze ji jiyana we kêma bibê lê; goşt, doldirme, şîranî, votka û nanê reş wê zêdetir bikeve



heyata we. Divê hûn wek xwarinên avî tenê hînî şorbeyê bibin. Ya bi rastî mesele qasê ku tunebûna xwarinên avî jî be mesele bi eslê xwe ev e ku Rûs ji bo hemû xwarinên avî dibêjin – суп - yanî şorbe. Û meseleya doldirme jî, di hemû çaxên salê de peydekirina doldirmeyan pêkan e, ew bufeyên ku ji wan re dibêjin киоск li ser her kolanî hene û tenê doldirmeyan difroşin. Di zivistana nizam çend derece bine sifirê de, wexta ku berf dibare û hûn nikarin destê xwe ji berika xwe derxin, ger hûn hin kesan bibînin ku doldirme dialêsin bizanibin ku ew Rûs in. Min ji we re behsa sermaye Moskovayê kir lê gelekî netirsîn, li vir gaz bê pere ye û heta otobês jî bi gazê tên germkirin.

Bi jiyana li Moskovayê re, di destpêkê de tehma xwarinan li xweşa we naçe – ya bi rastî hê jî li xweşa min naçe - lê piştî demekê hûn ê bikaribin bixwin. Tehma devê xwe nizanin lê zanin vexwin, gelekî divexwin, mesela ji mala me, şampanya, votka, viski filan kê nabe. Em taştîya xwe bi şampanya, firavîna xwe bi vîskiyê, şîva xwe jî bi votkayê timam dikin. Henek, henek!! Lê henek menek li aliyekî li Moskovayê votka gelekî erzan e, heqê votka û heqê aveke mezin wek hev e. Votkayeke 25î 105 Ruble ye yanî 7 TL. Û mîzgîniya min li we, dema hûn ji Rûsyayê vegehin Tirkîyê, sînora anîna alkole nîn e. Hûn dikarin bagaja xwe tije votka jî bikin.

Wekî din, helbet hûn ê bixwazin piçekî li bajêr bigerin, heqê we ye. Jixwe ger mirov di wan kolanên fireh de, di nav wan avahiyên sor û bilind de cixareyeke nekşîne, tişteke jî jiyana wî kê nabe. Wek gera bajêr, wexta hûn çûn zikê bajêr, li derdora

Kremlîn, Meydana Sor, Çemê Mosko hûn tehma jiyana Mosko distînin. Û ew kolana ku jê re dibêjin Арбат (Arbat) gelekî navdar e, wek Îstiklala Stenbolê, wek Karşiyakaya İzmirê û wek Kolana Sanatê ya Wanê, ya Batmanê û ya Diyarbekirê. Di nav gera xwe ya bajêr de hûn ê mîmariya ku jê re dibêjin сталинский ампи́р⁵ bi çavekî rût bibînin. Avahiyên gelekî gelekî bilind lê ji ber kolanên gelekî fireh û şînahiya derdorê qet kirêt xuya nakin. Berevajî vê; ihtimaleke mezin dibe ku kêfa we jî ji wan re were. Bi vê tarzê tu fêhm dikî ku Stalîne Dînik xwestiye hêza xwe bi rêya mîmariyê nîşan bide. Her tişt mezin mezin, mirêşdar û xemilandî.

Li gorî tecrûbeyên xwe dişexilim û dibêjim, her çi qas hûn bêjin ez li Mosko ji Kurdan û Tirkan dûr bikevim jî piştî demekê hûn ê bêriya Kurdan bikin, bêriya civatên dirêj ên bi Kurdî bikin. Dibe ku hûn bêriya axaftina Tirkî jî bikin. Dema ku we bêriya Kurdî û Kurdan kir cihek heye ku hûn kengî bixwazin dikarin herin li deriyên wan bixin, jê re dibêjin Mala Kurda. – ji bo we adresê jî li vir dihêlim; Вильгельма пика 4а Ботанический сад – Hûn li wir dikarin beşdarî civatên Kurdî bibin û dilê xwe bi axaftina Kurdî rehet bikin. Helbet li wir hûn ê xwarinên Kurdan jî bixwin, bê pere. Dibe ku piştî demekê hûn aciz bibin ji civatên wan ji ber ku karê wan tenê temaşekirina nûçeyan û afirandina Kurdistanê ye. Lê helbet li Moskovayê afirandina Kurdistanê jî tecrûbeyeke din e, divê mirov tehma wê jî meyzêne!

5 - Mîmariya Stalînistî



OMER BEXTIYAR
sonmezomer21@gmail.com

POP NÛÇE



El-Kamil fi t-Tarîx
Kurd di tarîxa Ibn el-Esîr de - I
Ibn el-Esîr

Berhema navdar a diroknas Ibn el-Esîr bo Kurdî hat wergerandin

Weşanxaneya avestayê xebatên xwe yên li ser tarîxa kurdî dimeşîne. Beşên li ser kurdan ên “el-kamil fi t-tarîx” a ibn el-esîr ku yek ji berhemên herî girîng ên tarîxa îslamê ne ji, ev beş bi destê emîn narozî, ji erebî bo kurdî hate wergerandin. Kitêb bi navê “kurd di tarîxa ibn el-esîr de” di meha gulanê de ji nav weşanên avestayê derket.

Filma Kurdî “Toren” ji Hollywoodê xelat girt

Derhênerê Filma Toren Kurdê Êzdî Newzad Şêxanî ye. Film di meha Gulanê de li Festîvala Fîlman a Hollywoodê di Beşa Filmên Biyanî yên Dirêj de xelata “Fîlma Herî Baş” girt. Şêxanî di 26ê Çîleya 2019an de bi merasîmekê wê xelata xwe bistîne.



Rojnameger û Helbestkarê Navdar Xelefê Zêbarî Wefat Kir

Rojnamevanê navdar Xelef Zêbarîyê ku yek ji damêzrenerê Pişka Kurdî ya Dengê Emerîka bû wefat kir.

Jan Dost romana xwe ya Kobanî bi Erebi ji belav kir

Romana kobanî'yê ya romanivîsê kurd jan dost, di sala 2017an de ji weşanxaneya darayê derketibû. Roman piştî kurdî bi zimanê din jî tê çapkirin. Nivîskar dost romana kobanî bi zimanê erebî jî derxist.. Jan dost nivîskarê romanên wekî mijabad û martîne bextewar e.





Akademiya Swêdê, Fîrat Cewerî xelat kir

Akademiyê ji bo ku berhemên edebiyata Swêdê wergerandine zimanê Kurdî, Xelata Edebiyatê ya 2018an da Nivîskarê Kurd Fîrat Cewerî. Wek POPKURD'ê cenabê Cewerî Pîroz dikin û em bi wî serbilind in.

Matematîkzanê Kurd Koçer Bîrkar mezintirîn xelata Bîrkariyê ya cîhanê girt

Bîrkarê xelatgir ji merîwana rojhilatê kurdistanê ye. Profesor koçer bîrkar dema xelat girt wilo got “hêvî dikim bi vê xelatê min dilê 40 milyon kurdan xweş kiribe.” Em wek popkurd'ê cenabê bîrkar pîroz dikin û em bi wî serbilind in.




Li Heskîfê taxeke şikeftan hat ditin

Heskîfa Batmanê ku bi çêkirina bendava Ilisû dê di bin avê de bimîne. Li Heskîfa dîrokî, xebatên arkeolojîk dewam dikin. Di dema lêkolîn û lêgerînan de di bin axa ku bi sedsalane weke bûstan tê bikar anîn, taxeke ku ji şikeftan pêk tê hat dît. Ev mehle ji 5 tebeqeyan pêk tê.

Romaneke din a Selîm Berekat dibe Kurdî

Romana nivîskarê Kurd Selîm Berekat a bi navê “Sebaya Sincar” (Sebiyên Şingalê) ku bi zimanê Erebî nivîsandiyê, ji aliyê nivîskar Ebdullah Şêxo ve ji bo zimanê Kurdî tê wergerandin.



Hunermendê Kurd Dilşad Seîd li ser muzîka Kurdî doktora kir

Muzîkjenê navdar Dilşad Seîd, di 19ê Hezîranê de, ji Zanîngeha Mozarteuma li bajarê Salizburg, di beşa mûzîka Kurdî de, li ser “vekolînek li ser mûzîka Kurmancî”, bawernameya doktorayê girt.